



### Kurd doza Kurdistanê dikin!

**SIYASETNEDARÊ** kurd Muayed Teyyib aşkere dike ku peywendiyên Herêma Kurdistanê bi Amerika, Yekitiya Ewropa û welatên cîran re gelekî baş in. Kurdistan li herêma weke navenda aramiyê dihête destnîşan kirin. **RÛPEL-3**



### Portre: İdrîs Barzanî

**30** sal di ser koça dawî ya kurê mezinê ê Melle Mistefa Barzanî İdrîs Barzanî re derbas bûn. Hevreyê nêzikê İdrîs Barzanî di 30 saliya koça dawî ya İdrîs Barzanî de biranînên xwe nivîsîn. **RÛPEL-6**



### Hekîme bajar: Pîr Şalyar

**LÊKOLÎNER** Enwer Rewşen di vê gotara xwe de behsa Pîr Şalyar û nerîteyên qedîm ê diroka kurdan dike. Di gotarê de derbarê kurdan de gelek zanyariyên nû dihêne belav kirin. **RÛPEL-9**



## ROJAVAYÊ KURDISTANÊ:

# BALANSA HÊZÊ DIGUHERE

#### > WASHINGTON – HEWLÊR BO ROJAVA STRATEJÛYEKA NÛ DATÎNIN

Daxûyanîyên Trump yê derbarê avakirina herêmên aram li Sûriyê û Rojava weke guherîna balansê hêzê li herêma dihête şrove kirin. Amaje li ser wê yekê heye ku Trump dê li rojavayê Kurdistanê û Sûriyê jî digel Hewlêrê paln û stratejîyekê deyne.

#### > ENKS BO SIBEROJA SÛRIYÊ Û ROJAVA DIÇE WASHINGTONÊ

Li aliyê din nûnerên ENKS bo gotûbêjan ji aliyê DYA ve hatine vexwendin. ENKS dê di dawîya sibatê de bi rayedarên Wezaretê Derve ya DYAYê re bicive û dê bi çavdêriya Hewlêr – Washingtonê Pêşmergeyên Roj derbasî Rojava bibin.

#### > HEJMARA PÊŞMERGEYÊN ROJA ZÊDE DIBE

Dihête çaverêkirin ku hejmara Pêşmergeyên Roj ji 8 hezarî bibe 15 hezar. Herwiha pêşmergeyên nû dê navê xwe bo xolên rahênanê tomar dikin û ew jî dê ji aliyê DYA û hevpeymanîya navneteweyî bihêne perwerde kirin û dê çek bo wan bihêne şandin.



**EKREM ÖNEN >02**  
Rûsya - Amerika bo Rojavayê Kurdistanê çi dixwazin?



**HOŞENG OSÊ >06**  
Dewleta kûr ya Cemil Bayik III



**NADÎRE GUNTAŞ ALDATMAZ >10**  
Ma reyna bixeyr dî



**FIRAT CEWERÎ >12**  
Erich Auerbach û Mimesisa wî



### DÎWANÊK HEYE, MÎRÊ MIN! DEMBUHÊRKEK LI PIRTÛKXANEYA EL CEZERÎ

**PIRTÛKXANE** ne tenê ew cî ne ji bo ku mirov kitêban nas bike, kitêbxane ew cî ne ku mirov pirtûkên li pirtûkxaneyên xwe yên malê tune ne jî peyda bike.



### HUNERMEND SEBAHATTİN YILDIZ: STRANÊN KURDÎ HATÎNE DIZÎN

**YÊN** ku bi tirkî, farsî, erebî hilbijartine û hunera xwe bi wan zimanan derdibirrin bi ya min ruhiyeta wan ya kurdî tîne. Ez vê yekê jî nişan bidim ez ne lihember im ku bi zimanê din stranbihêt gotin.





EKREM ÖNEN

Rûsya - Amerîka bo  
Rojavayê Kurdistanê  
çî dixwazin?

Wek tê dizanin ev demeke dîsa pirsgerêka Sûriyê û rojavayê Kurdistanê di rojeva cîhanê, bi teybet di rojeva zilhezên navdewletî yê wê Rûsya û Amerîka de ye. Bê guman aloziya li Sûriyê ev demeke dirêje destpêkirî ye. Destpêkê de welatên koalîsyonê ku 38 welat in, bi serokatîya Amerîka destavêtin pirsgerêka Sûriyê, paşê Rûsya ket nava protsesa bûyerên Sûriyê. Wek tê dizanin koalîsyona navdewletî ku piştigirî dida muxalefeta Sûriyê ji ber gelek sebebên siyaseta wan bi ser neket, bi ketina Rûsya nava protsesa Sûriyê ku di demeke kin de gelek serkeftin li hember DAIŞê bi dest xist, bû sebebê ku êdî Amerîka ne bi koalîsyonê re a bi Rûsya re li rêyên çareserîya pirsgerêka Sûriyê bigere. Administrasyona Obama xwest bi Rûsya re bikaribin li rêyên çareserîyê bigerin, li ser vê Obama û Putin li hev kirin û wezîfe dan Her dû wezîran Lavrov û Kery ku li rêyên çareserîyê bigerin. Piştî gelek rûniştin û dan û stendin û çend civîn bi teybet du civînê paşê li Cenev û Moskova ku di navbera Lavrov û Kery de ku her yek ji wan 8 û 4 seetan dewam kir û piştî civîna Moskova ku Lavrov û Kery derketin pêşberî medya û gotin piştî guftûgoyên dirêj em gihan encamêkê. Li ser pirsê rojnamevanekî, sistema îdarî a paşeroja Sûriyê wê çawa be? Herdu wezîran gotin me li hev kir ku Sûriyê bibe welatekî federal.

Rûsya û Amerîka bi hev re li Sûriyê navendên li hevanîna rejîm û muxalefêta ava kirin. Her weha hinek çalakî li hember DAIŞê kirin. Lê Amerîka di pirsê kîjan grupên çekdar lazim e "terorîst" bû bi nav kirin her problem derxist, paşê eşkere bû ku problem ne ev bû. Problema tifaqa Lavrov û Kery ne çû serî ew bû ku di nava administrasyona Obama, Pentagon û CIA de nakokî li ser tifaqa Rûsya û Amerîka hebû. Kery ji medya re eşkere kir û got Rûsya bi tifaqê pêbende bes problem a nav Amerîka ye. Ji ber Kery terefîdarê tifaqa bi Rûsya re bû. Wek tê dizanin ev dem dema beriya hilbijartina bû û Amerîka berê xwe da bû hundurê xwe bi hilbijartina mijûl bû lê di propagandayên beriya hilbijartina û beyanê Trump û administrasyona wî ji me re di dîde rêdan di pirsê Sûriyê de û di pirsê tifaqa bi Rûsya re nakokî di nava dezgehên dewleta Amerîka de hebû.

Di van pirsan de li Amerîka nakokî ne a navbera partîyan debû nakokî a navbera dezgehên dewleta Amerîka bû. Wek Mînak nuha di nava hevalên Trump ên Cûmhûriyêti kesên wek John Mc Cain li dijî wê siyaseta Trump e her weha di nava partîya dijberê Trump Demokrata de kesên wek Kery piştigirî didin siyaseta Trump. Ev ji me re di dîde rêdan ku nakokiyên dezgehîne ne partîfîne. Weha diyar e li hev kirina Lavrov û Kery wê wek heye nuha administrasyona Trump bi Rûsya re li Sûriyê pêk binin, ji ber wê Trump fîlî tiştêkî nuha nake tiştê berê Lavrov û Kery kiriyê wê têxe praktîkê. Dema tê gotin Rûsya û Amerîka di pirsê Sûriyê de li hev kirine rast e.

Divê Kurdên Rojava dest jî daxwaza federasyonê bernedîn, Rûsya û Amerîka li ser wê li hev kirine. Erebb (muxalefêti û Rejîm) û kurd bixwazin an ne xwazin wê planê Rûsya û Amerîka li Sûriyê pêk were, li hember veyî Tirkîyê û Îran jî nikare bisekine. Divê kurdên Rojava xwe jî wê re amade bikin û siyaseteke li gor wê bimeşînin.

Bê dengîya Tirkîyê li hember reşnîvîsa ji bo yasaya Sûriyê ji me re di dîde rêdan ku Tirkîyê ji Sûriyêke unîter şîe ku di kontrola Îranê de ku dor 1000 km li ser hudûde wê be, wê Sûriyêke federal ku li ser hudûde wê hinek kurd hinek jî suneyên Sûriyê ku xwe nêzi Tirkîyê dibînin hebe tercîh bike. Ji ber umetçiyên sune ku îroj li Tirkîyê li ser hukumun deewletek wek Sûriyê unîter şîe ku temami di kontrola Îranê de be ji bo xwe gelek talûke dibîne. Bê dengîya wê yek jê eve, ya dudu jî bê çarretîya wê ye. Îran jî heta jê tê dixwaze Sûriyê welatekî unîter be û di kontrola wê de. Bê guman ev ne tê hesabê Rûsya ku çendak berê bi Sûriyê re ji bo mana basê wê yê eskerî li Sûriyê, tifaqê ji bo 49 salan bi Sûriyê re çêkir. Her weha nayê hesabê Amerîka jî ku Îran li herêma Rojhilata Nêzik xurt bibe. Bê dengîya Tirkîyê ewe ku Tirkîyê bi xwe hazîriya sistemê federal (eyalet) li ser asasê geografi dîke.

Tirkîyê baş dizane ku ew reforman neke dikare bûyerên mestir bibe. Ev reformên bikin jî dimîne çawayê? Bi ya min Tirkîyê bi van reforman dixwaze wek balona ji bo neteqe tu hinek ba jê berde. Îran jî weke Tirkîyê wê reforman bike, ji xwe li Îranê herêmên liser asasê geografi hene lê ev heta derecêkê formele ewê jî hinek guhertinan wek Tirkîyê bike, ev wê demên nêzik pêşîya me wê eşkere bibe. Tirkîyê û Îran baş dizanin piştî Sûriyê dora wan e û herdu jî bê çare ne. Ji ber wê divê kurdên Bakur û Rojhilata Kurdistanê jî xwe jî guhertinên mezin re amade bikin. Divê kurd baş bizanibin ew bi xwazin an ne xwazin, guhertin li herêma dibin û ev guhertin di berjewendiyên kurdan dene. Kurd li ser hev bin siyaseteke netewî bimeşînin wê destkeftiyên bi dilên xwe û bi xesarek hindik bi dest xînan na wê her destkeftî-îyan bi dest xînan lê dikare bi xesarek mezin be û ev destkeftin ne temami bi dilê wan be.

P.S. Ev gotineke peşîyan a rûsane "Hemû tiştên nuh, tiştên kevnin ku hatine jî bir kirin.

ROJAVAYÊ KURDISTANÊ:

# BALANSA HÊZÊ DIGUHERE



**E**NCUMENA Niştîmanîya Kurd li Sûriyê (ENKS) ji aliyê Wezaretê Derve ya Neteweyên Yekbûyîyên Amerîkayê (DIA) ve hat vexwandin. Ligor zanyariyên ku heftanemeya Basê ji rayedarên ENKS bi dest xistine; ENKS dê di dawîya meha Sibate de biçê Washingtonê û li wê derê bi rayedarên Wezaretê Derve yê DYAYê bicive. Ji ENKSê kî dê beşdarî civîna li Washingtonê dibê, ne diyar e. Lê tê destnîşan kirin ku endamên ENKSê yê ku beşdarî civîna Astanayê bûn, dê biçin Washingtonê. Liser mijarên civîna di hêst çaverê kirin ku şandeya ENKS û rayedarên Amerîka liser mijarên hevditînên Astana û Cenevreyê (ku di 20 Sibate de bê li dar xistin), kêşeyên kurdan û bûyerên dawîyên Sûriyê bicivîn. Herwiha piştewanîkirin Pêşmergêyên Rojê û avakirina herêmên ewle jî di rojeva wan de ye.

Li aliyê din di nava hefteyê de ENKS bi Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî re civîya. Herwiha wan

Nûnerên ENKSê di nava hefteyê de bi Serok Mesûd Barzanî re civîyan. Serkirdeyên ENKSê askere kirin di civînê de Barzanî piştewanîya xwe bo ENKSê dîpat kirîye û anîye ziman ku Kurdistan mala her kurdekî ye.

civîna Astana, amadekarîyên bo danûstandinên Cenevê, rewşa kurdan li rojavayê Kurdistanê, rahênerîya Pêşmergêyên Rojê ji aliyê koalîsyona navneteweyî gotûbêj kirine. Li aliyê din Mesûd Barzanî Serokê Herêma Kurdistanê di nava hefte de pêşwaziya Roberta Pinotti Wezîra Berevaniya Îtalya û şandekî digel wî kir. Dihêst zanîn Îtalyayê dest bi rahênerîya Pêşmergêyên Rojê jî kirîye. Herwiha Îtalya dê çek û taqemenîyan jî bo Pêşmergêyên Rojê bihinere.

Amerîka piştewanîya Pêşmergêyên Rojê bike Şewirmendê Encumena Asayîşa Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî di hevpeyvîneka xwe de ragihandibû û jî berpirsên Amerîkayê xwastibû li Sûriyê di şerê DAIŞê debihêzên pêşmergêyên rojavayê Kurdistanê re kar bikin. Çimkî ew hêz tekane hêza bi bandor û pîralî ye û dikare aloziya siyasî ya li wê deverê vemirîne û aliyên siyasî nêzîkî hev bike. Pêşmergêyên Rojava ku bi navê "Pêşmergêyên

Roj" dihêne nasîn, li başûrê Kurdistanê hatine perwerdekirin û ji destpêka şerê DAIŞê cihê xwe di sengerên şer de girtine. Ligor zanyariyên Basê ji çavkanîyên bi ser Pêşmergêyên Rojê standine hejmara Pêşmergêyên Rojê nêzi 8 hezar kesî ye û piştî rahênerîyê dê hejmara wan zêdetir bibe. Lê xuya ye ku bangwazî û diplomasiya Herêma Kurdistanê DYAYê jî anî ser xetê. Çimkî ENKS ragihand ku Hevpeymanîya Navneteweyî Pêşmergêyên Rojê perwerdebikin. Endamên ENKSê jî rojnemeya Heftanemeya Basê re ragihandin ku li Amerîkayê derbarê Pêşmergêyên Rojê de bi hûrgilî biaxivin. ENKS hewl dide ku hejmara Pêşmergêyan jî 8 hezaran de bike 15 hezar.

Ji aliyê din wê di heman demê de du rûdanên giring pêk hatin. Serokê DYAYê Donald Trump jî bo Rex Tillerson wekî Wezîrê Derve yê DYAYê tayîn kir. Rex Tillerson wekî dostê nêzik ê kurdan dihêst zanîn.

**Serok Barzanî: Herêma Kurdistanê mala her kurdekî ye**

Di nava hefteyê de li Selahedîn Mesûd Barzanî Serokê Herêma Kurdistanê pêşwaziya Serokê Encumena Kurdên Sûriyê û Sekreter û Nûnerên Partîyên siyasîyên nav Encumena Kurdên Sûriyê kir. Malpera fermî ya Serokatîya Herêma Kurdistanê derbarê civînê de daxûyand ku li hevditînê de guftûgo liser civîna Astana ya li welatê Qazaxistanê û helwesta aliyên beşdarbûyî yê wan di derbarê paşeroja Sûriyê de kir. Serok Barzanî pèzanînen xwe yê helwestê û xweragîriya partîyên siyasî yê wan ENKSê nîşan da û tekez li wê yekê kir ku biryar û paşeroja kurdan li Sûriyê di destê wan de ye û dibe ku wan menhecêka rast heye û liser berjewendiyên neteweyî yê gelê kurd hengavan diavêjin. Barzanî ew yek jî xiste rû ku bi hemû şîyanekê ve dê pal-piştîya daxwaz û mafên gelê kurd li Sûriyê bike û Herêma Kurdistanê jî wekî mal û piştewanê xuşk û birayên kurdan li Sûriyê dimîne.



NURÎ BRÎMO:

## PÊŞMERGE DÊ DERBASÎ ROJAVA BÎBÎN

**N**URÎ Brîmo Endamê Mekteba Siyasî ya Partîya Demokrata Kurdistanê Sûriyê (PDKS) jî Basê re askere kir ku hevpeymannîya navneteweyî bo rahênanana Pêşmergêyên Rojê planekê dana ye û niha bi hezaran pêşmerge bo şerê dijî DAIŞê dihêne perwerdekirin û ew amadekarîyê dikin daku derbasî Rojavabîbin. Brîmodî berdewamîya axaftinaxweda destnîşanî bicivîna ENKSê ya ligel Mesûd Barzanî jî kir û daravekir ku Barzanî piştewanîya xwe bo ENKSê carekê dîndîpat kirîye.

Brîmo nerazîbûna xwe liser daxuyaniya berpirsê TEVDEMê Aldar Xelîlanî ziman û amaje li ser wê yekê kir ku lawên kurd ê Rojava bo parastina xelkê kurd bûne pêşmerge ew dê derbasî rojavayê Kurdistanê bibin û dê Aldar

Xelîl û PYD jî li wan temaşeyê bike.

Nûnerê PYDê Aldar Xelîl dimedyabiser PKKê de askere kir ku ew Pêşmergêyên Rojê derbasî Rojava bibin ew dê şerê wan bikin.

**Hawaz Egîd: ENKS bo Washingtonê hatiye vexwandin**

Hawaz Egîd Endamê ENKSê derbarê Pêşmergêyên Rojê de ji Basê re axivî û diyar kir ku Pêşmergêyên Rojê di destpêkê de jî kesayetên kurd ên Sûriyê ku di nav leşkerên rejîmê de bûn, dûrketin. Piştî beryarandin bibangêka leşkerî beramberîya welatîyên Sûriyê bikin. Di dawîyê de jî leşkerên rejîmê qût bûn û gihaştin Kurdistanê Iraqê û bûn bîngeha avakirina Pêşmergêyên Rojê. Hevpeymanîya navneteweyî

jî nihîpiştewanîya wandike. Herwiha Amerîka piştewanîya xwe dê bidomîne. Bi rojanê jî hejmara Pêşmergêyên Rojê zêde dibe.

Egîd derbarê vexwandina ENKSê ji aliyê DYAYê û mijarandewanîyên ku di destpêkê de jî kesayetên kurd ên Sûriyê ku di nav leşkerên rejîmê de bûn, dûrketin. Piştî beryarandin bibangêka leşkerî beramberîya welatîyên Sûriyê bikin. Di dawîyê de jî leşkerên rejîmê qût bûn û gihaştin Kurdistanê Iraqê û bûn bîngeha avakirina Pêşmergêyên Rojê. Hevpeymanîya navneteweyî



KURD DOZA SERXWEBÛNÊ DIKIN

# MILLETÊ KURD DOZA SERXWEBÛNÊ DIKE



MEHMED SALIH BEDIRXAN

**M**HEYED Teyib nivîskar, şair û siyasatmedarê kurd derbarê peywendiyên Hewlêr – Bexdayê, helmetên Nûrî Malikî yên diji Herêma Kurdistanê, siyaseta PKKê li Şengalê ji heftnameya Basê re axivî. Teyib aşkere dike ku xelkê Herêma Kurdistanê dixwaze biryarê li ser çarenivîsa xwe bidin. Herwiha li Kurdistanê Iraqê di sala 2004an de referandûmeka nefermî bûbû ji sedî 98 ji xelkê deng dabûn bo serbixwebûna Kurdistanê. Îro ji milletê kurd dixwazin Kurdistanê serbixwe be.

**Ligor hin zanyariyan Serokê Hizba Dawa Nûrî Malikî dîsa dest bi dijayetiya Herêma Kurdistanê kiriye. Herwiha Malikî beriya bi çend rojan got, "kurd serxwebûnê naxwazin" çî ajendeya Malikî heye û çîma dijayetiya Kurdistanê dike?**

Berjewendiyên Kurdistanê çî ne, ka kurd çî dixwazin, çî naxwazin. Bi rastî jiber ku xelkê hemû Kurdistanê bi çavê dijminatîyê li Malikî dînerin, hemû dizanin Malikî ye ê ku bûye sedem DAÎŞê li Zîmar û Kerkûkê êrişî Herêma Kurdistanê bike. Li Herêma Kurdistanê Serok Mesûd Barzanî dibêje em ê referandûmê bikin. Hêştare-



ferandûmnebûye, encamên referandûmê hêştare nehatine diyarkirin. Jibo wê ji kesekî ku emro bêje xelkê Herêma Kurdistanê naxwazin ji Iraqê cuda bibin an naxwazin dewleta serbixwe ava bikin, ev gotin bê binema ye, ew ê gotineka vala be. Lê ez naxwazim weşerim ku hin hêzên li Kurdistanê têkilîyên wan bi Malikî re hene, û wê gotineka wisa ligel Malikî kiribin. Em dizanin hin parlamentarên kurd û êştare Yekîtî, Goran li Bexdayê dibêjin ku gelê Kurdistanê dixwazin ligel Iraqê bimînin, Kurdistanê naxwazin. Ez dîr nabînim hin aliyên kurd ev gotibin ligel Malikî.

Serokê Encumena Yekîtî Niştîmanî Kurdistan Adil Mûrad her roj dibêje; 'em dixwazin bi Iraqê ve bin, em dixwazin ji Iraqê cuda nebin, dixwazin Herêma Kurdistanê neheqê bikin. Malikî dizane ew nûnertiya xelkê Kurdistanê nakin.

Li Kurdistanê Iraqê sal 2004 bû, referandûmeka ne fermî bûbû ji sedî 98 ji xelkê deng dabûn bo serbixwebûna Kurdistanê. Rûdawê ji rapirsîyek kiribû, di vê rapirsîyê de jî sedî 84-85 xelkê Kurdistanê gotin em dixwazin di Kurdistanê serbixwe de bijin. Jibo wê jî ez piştrast dibim guman nîne ku her wextekî referandûm bête kirin ê xelkê Kurdistanê dê bêjin, ne tenê kurd xelkê asûr, keldanî, turkoman, suryan û hindek ereb jî tenanê ew ên ku cîranê Herêma Kurdistanê ne dixwazin Kurdistan ji Iraqê cuda bibe, û bibe dewleteka serbixwe. Çunkî em dizanin Iraq dewleteka şkestî ye, hemû pêkhatiyên Iraqê dizanin paşerojeka reşli bendê Iraqê ye. Kurd wê nexwazin pişkek ji wê dewlete bin, ku ber bi paşerojeka xirab ve diçe.

**Ez dixwazim werim ser diplomasîya Herêma Kurdistanê, Rex Tillerson CEOyê berê yê Exxonê weke dostê kurdan dihête zanin niha bûye Wezîrê Derve yê Amerikayê. Ew demeka dirêj li Kurdistanê bû. Peywendiyên Trump û Herêma Kurdistanê dê çawa bin?**

Belê birastî serkeftina diplomasîyê li Herêma Kurdistanê ji valatîyê nehatîye, serkeftina diplomasîya Herêma Kurdistanê bêjin siyaseta hekimane ya xizmeta Herêma Kurdistanê bûye. Em hemî dizanin ku li Kurdistanê pêkvejiyana dîn û neteweyên



Guman nîne ku her wextekî referandûm bête kirin ê xelkê Kurdistanê dê bêjin, ne tenê kurd xelkê asûr, keldanî, turkoman, suryan û hindek ereb jî tenanê ew ên ku cîranê Herêma Kurdistanê ne dixwazin Kurdistan ji Iraqê cuda bibe, û bibe dewleteka serbixwe.

cuda cuda di asteka bilind de ye, cudayî nîne ne di navbera dînan de ne navbera zîmanan de, neteweyan de. Heta niha miletê kurd di serboriya xwe de heta îro wisa diyar kiriye ku kurd mileteki bi tolerans e mileteki baweri bi insanane heye. Ev yek, ya duyem jî, ew navên demokrasîyê ku xizmeta Herêma Kurdistanê kirine digel hemî kêmasîyan jî kemûkurtîyan jî sistemekî demokrasî peyraw bikin li Herêma Kurdistanê. Herêma Kurdistanê bêjin deriyê xwe vekiriye jî hemî awareyan, awareyên ereb jî ji navenda Iraqê, niha li Duhokê ku parêzgeheka nifûsa wê milyonek û 700 hezar e, 800 hezar penaber û aware hene. Qasî xelkê Duhokê penaber û aware lê dijîn. Û hemî ew rêxrawên navneteweyî ku hatine Kurdistanê pesnê Herêma Kurdistanê dayine û xizmeta Herêma Kurdistanê serhindê ku ew bixwe jî girîftiyên aborî hene, dîsa jî hemî îmkân dayine ber ku rewşa aware û penabera li Herêma Kurdistanê baş bibit.

Taybetî rolê cenabê Serok Mesûd Barzanî û têkilîyên wî ligel dewletên mezînan, bêjin dewletên xwedîbiryar biryar dane ku mezintirîn konsolxaneyan li Rojhilata Navîn li Hewlêrê vekin, kar tê de bête kirin. Ev e hemî weke ku ez bawer dikim, ev yekem serkeftine ku li dijî DAÎŞê hatîye kirin. Peywendîya diplomasî ne

ku Amerîka bi tenê ye, Ewropa, Yekîtîya Ewropa bi Rûsyayê re jî ne xirab e, dewletên cîran jî re, ev hemî kiriye ku bawer dikim Trump jî dê berdewam be liser piştevaniya Herêma Kurdistanê.

**Li rojavayê Kurdistanê behsa herêmên ewle, derbasbûna Pêşmergeyên Roj, bo Rojava dihête kirin. Vegera Pêşmergeyên Roj bo Rojava dê aramî û îstîqrarê pêk bîne?**

Ev bi rastî destpêk e jî, destpêka Şoreşa Sûriyê de jî rola cenabê Serok Barzanî ew bû her hêzêke Kurdistanê Sûriyê bike yek. Penaberên wexta hatin, jî wan penaberan hêzek dirust kirin, ew ne hêzeka tenê eskerî, derbarê îdareyê de bû jî, îdareya Kurdistanê Sûriyê wê çawa bi rê ve biçê. Ji destpêkê heta dawiyê jî şîreta Serok Barzanî li hemî hêzên Kurdistanê Sûriyê ew bû ku bibin yek û hewl bidin wek tecrûbeyên li Kurdistanê Iraqê çêbû, ew şîreta li Başûr çêbûye li wir jî çêbikin. Ew bêjin Hêzên Kurdistanê Rojava, çawa ku hêzên başûrê Kurdistanê di sala 1995î de nakokî navbera wan de hebû, tenanet şer jî kirin lê dîsa xizmetek ava kirin, kesî li kesî qedexe nekirin ku çalakîyên xwe li Herêma Kurdistanê nekin. Evya çêbûye jî, bi rastî PYD, ew siyaseta peyrew kiriye ku hewl dide rê nede ti hêzên din ên kurd-

istani. Wiha kirin li Sûriyê jî di nav xwe de xelkê Kurdistanê Sûriyê bi çavê xirab temaşeyî wan bikin. Him derveyî Sûriyê jî çavê xirab temaşeyî bikin. Eger me bivê devereke tena, herêmeke tena li Kurdistanê rojava çêbibit û begûman hêzên siyasî divê neyên qedexe kirin. Pêşmergeyên Roj, ENKS an partiyên din ên Kurdistanê Sûriyê, ên xelkê Kurdistanê Sûriyê ne, çênabe partiyek siyasî bêje ev welat ê min e û rê nede çî hêzên di yên siyasî. Kurdistanê Sûriyê welatê hemî kurdên Sûriyê ye, welatê hemîyan e. Eger em daxwaz bikin, em bêjin welatên di, rejim ber bi demokrasîyê biçit lazîm e em beriya her kesî ser xwe qebûl bikin. PYD bi vê siyaseta xwe ya îro peyraw dike, paşerojeka geş çênake. Hêzên din jî alikariya wan bikin qebûl nakin tenê hêzek bibe hakim û hêzên din qedexe bike. Jibo wê jî ew devereke çêbibe li Kurdistanê Sûriyê, divê devereke azad be, azadiya karê siyasî hebit, hejmareka gelek mezin a endamên ENKSê penaberê wan e ku îro li Kurdistanê Iraqê dijîn diviya beşdar bibin. Ew bêjin jî bili me kes li vir kar nekin, ev siyaseta çewt e, sernakeve û hêvîdar im ku paşerojeka geş ji bo Kurdistanê Rojava hebit, hemî hêzên siyasî bi hev re biryarê bidin ka paşerojê çawa bikin, şiklê îdare û xizmeta wê çawa be.

## DIVÊ PKK JI ŞENGALÊ DERKEVE!

**Axir pîrsa min ev e, her çend rayedarên Hikûmeta Herêma Kurdistanê bang li PKKê jî dikin, ew jî Şengalê dernakeve. PKK çîma jî Şengalê dernakeve û PKK li Şengalê çî dike?**

Tudizani birastî jî tiştekî gelekîseyre, nuke, carna PKK dibêjin nehatine alikariya xelkê Şengalê, emhatine Şengalê azad bikin, û tiliya xwedîkin nav Kurdistanê Îranê, nav Kurdistanê Sûriyê, nav Kurdistanê Iraqê. Nimûneyekê jî tînin dibêjin wextekê Mela Mistefa Barzanî jî çûbû Mahabadê. Mela Mistefa Barzanî dema çû Mahabadê jî Qazî Muhamed regot, 'ez leşkerekî teme, serbazekî teme, ez hatim vê derê berevaniya tebikim, hevkarî bikim. Em dizanin pêşmergeyên Kurdistanê çûn Kobanê, dema Kobanê rizgarbû, PYD got; 'êdî hewcedariya mebiwenîne, pêşmergecarekê divê geriyayî xwe. Eger ew bo alikariyê hebit, jî bo alikariyê hatibin, divê rêzli Hikûmeta Herêma Kurdistanê rebigrin. Megotîyem naxwazin hêzên dewleta Iraqê bilaneyên Herêma Kurdistanê, hikûmeta Iraqê rêzê li me digrin, û wê qebûl dikin.

Divê PKK jî rêzli Hikûmeta Herêma Kurdistanê rebigrin. Karê wannemaye û nebûye, jî bilitêk danê tifeyde yawan jî Şengalê renabit. Ew bixwed dibêjin, eşkere dibêjin, jî qey meqamê Şengalê regotibûn, 'emrê medîdestê Ebadîdeye, destê Bexdayê de ye, ew çêbînem guhdariya wandîkin, em hukûmeta Herême

nasnakî, em hukûmeta Iraqê nasdikin. Yanê tu vîmantiqê bokurdekî bîjî, li Herêma Kurdistanê hikûmetek heye, dibêjin Herêma Kurdistanê, û hêzek derveyî Herêma Kurdistanê bêtî bîjî zêguh dariya wanakin, em Hikûmeta Herêma Kurdistanê nasnakî, em bixafîna Ebadîdikin, em tirafê bixizmeta Herême nakin. Yanê gelekêşkerê ye, evê tenê birastî jî nehatineboxizmeta Herêma Kurdistanê, xelkê Şengalê belkî bo Şengalê hin ajendayên Iraqê û Îranê li wê derê çibîbikin.

Biryaraparlamena Kurdistanê heye kunabiteskerê li Iraqê bête Herêma Kurdistanê hetakuparlamena Kurdistanê razi nebitin. Ewan dixwazin bêtî nav Kurdistanê dixwazin birîya PKK werin, hetavê yekê jî, mixabin vê daxwaz xizmeta Iraqê çibîbikin, Hikûmeta Herêma Kurdistanê naxwazetîşerdi navberahêzên kurdederkeve, bitaybetî jî şexsê cenabê Mesûd Barzanî gotîye; 'êdî ticarî bitîsedemê çênabit kurdêşerêhev dibîkin lê manawanalî Şengalê, berdewambûna wan, îsraawan bolî Şengalê bimînin, nehêlin Hikûmeta Herêma Kurdistanê boxelkê xizmetê bike. Em tîrsînen camên xirabê derkevin, hêvîdarin PKK başbizanî neberjewendîya PKK ye, neberjewendîya xelkê Şengalê ye, neberjewendîya Herêma Kurdistanê ye bo PKK livê derê bimîne. Karê wan diyare, meydanaxebata waniyare, eger ew xebatê bo Kurdistanê dixwazin diviya rênedin bo karê Hikûmeta Bexdayê.





# KOLBER, MEXDÛR YAN TAWANBAR

■ AGIRÎ ISMAÏLEJAD

**P**EYVA kolber, yek ji wan peyvên legmen e, ku ji zimanê kurdi bi rêya ragihandinê ketiye zimanên din û tenanet di ragihandinên nekurdi de jî dihête bi kar anin. Di kurdiya sorani de kol dihête wateya piştê, û kolber, yan kirêkol jibo kesekî dihête gotin ku bi piştê xwe yan swarî hêstir û çarpêyên din kelûpelan di navbera sinorên du welatan de vediguhêzin. Wataya peyvê bizelalî rewşa estema kolberiyê di hêla cestayî ve derdixê holê, lê belê nişan nade ka hokarên aborî û civakî yên "kolberîkirinê" çî ne.

Kolberî cureyekê kar nîne, ango di rewşeka asayî de, jibo dabinkirina mafê jiyane hêza karê xwe bo aliyekî bifroşin û heta jê bihêtê pê jiyara xwe bikin, lê belê diyardeyeka aborî-cografîye, ku di doxeka aborî û cografîyayeka taybet de ser hildaye. Di vê diyardeya taybet de hin mirov di bin guşara aborî de, bêyî liberçavgirtina metirsîyên vîkarî û bêyî gringîdan bi "mafê jiyane" pêxemet debara xwe û peydakirina jiyara xwe neçar in hêza fîzîk û endamine cestayê xwe wekî sermaye di pênav jiyane de bifroşin, yan wekî bixwe dibêjin; jibo jiyara xwe mecbûr in qumarê bi jiyana xwe bikin.

## Gelo çima gring e bihête destnişan kirin ka kolberî kar e, yan diyardeyeka aborî?

Min niyet nîne, ez trajedîyekê binivîsim; babeta kolberîkirinê û trajedîyên ku dihêne serê kolberan jixwe bûye rojeva xelkê Kurdistanê. Her roj em dibihîzin û dibînin ku hind kes jiber kolberiyê dihêne kuştin. Lê xala lêramînê ev e, ku medyaya dewlet û berpîrsên wê ne tenê xwelihembervan rûdanan berpîrs nabînin, tenanet kolberan wekî "tawanbar" dihêne pênasê kirin.

Li vir gengeşkirina kolberiyê wekî diyardeyeka aborî jî wê perspektîvê gring e, ku jibo me zelal be aya kolber tawanbar e, yan mexdûr.

## Hokarên peydabûna kolberiyê

Kesekî kolber, ku pîrraniya wan ciwan in (bo minak rêjeya temenê navincî yê kolberên ku di şeva 27 Janvîyeya 2017ê de li Serdeştê ketin bin aştê û canê xwe jî dest dan, 24 bû), divê sinorên du welatan bi şeweyekê neqanûnî bibezîne û di heman demê de barekê 70 heta 80 kiloyî û zêdetir heta wî aliyê sinorî bibe. Bo wî karî, ango



veguhastinabar, kujmekê diyarkirî pere wekî destmiz werdigire.

Asteng ne tenê di bihurtina vê rêyê de ye, lê herwiha metirsî jî têde hene; wekî guleberdana rasterast ya hêzên ewleyî yên Îranê di dema têperandina sinorî yan pêlîkirina minan, ku metirsîyên herî berceste yên karê kolberiyê ne.

Heta vê derê ruwaleta kolberiyê dibêje me, ku digel hemî metirsîyên ku liser rêya wan e, madem kesek digel hindêkên din rê dîkevin, ku bi destmiz karekî bike, wê demê ew dibe pişe, ew kolberî dibe karekî û ligor qanûnê divê bihête rêxistin. Yan jî divê wekî pişeyekê qanûnî yan neqanûnî liser biryar bihête daîn. Bêguman dewlet dikare liser qanûnî yan neqanûnîbûna wê biryarê bide. Heger ev pişe jî aliyê hikûmetê ve wekî pişeyekê neqanûnî bihête destnişan kirin, bêguman metirsîyên taybetên wê jî dê hebin; ango encamdana wê pişeyê dê sîza û ceza jî bi dû xwe re bihîne.

Kêşe di vir de ye, ku di rastiyê de kolberî ne rêkeftinek di navbera du kesan de ye, ku girêdayî rewşeka asayî be, lê rêkeftinek e, ku di derencama guşareka aborî li Îranê di navbera du kesan de dihête pêk hatin. Kolberî rêkeftinek e, ku di rewşeka neasayî ya aborî de, di

Min niyet nîne, ez trajedîyekê binivîsim; babeta kolberîkirinê û trajedîyên ku dihêne serê kolberan jixwe bûye rojeva xelkê Kurdistanê. Her roj em dibihîzin û dibînin ku hind kes jiber kolberiyê dihêne kuştin.

encama siyaseta aborî û ewleyî ya dewlet û cografîyaya Kurdistanê de hatiye pêk hînan. Ji lewre, kesê kolber, kesekê neşareza, destberdayî yan kesekê asî û qanûnbezin nîne; lê nebûna derfetên aborî bo peydakirina jiyarê wisa kiriyê ku hindê kes bi karên kolberiyê rabin; ango qeyrana aborî û tengijeyê kar e, ku wisa kiriyê hindêk neçar biminin dest bi wî karî bikin.

Kolberî tenê girêdayî îradeya kolber bixwe nîne, berovajî, karê neqanûnî bi îrade û biryara bikirî bixwe bo encamdana kirdarê dihête di. Lê li vir zexta aborî ya ku di derencama siyaseta aborî û emnî ya hikûmeta navendî de hatiye afrandin, bûye hokarê peydabûna diyardeya kolberiyê. Heger wisa be, kolberî ne cureyekê kar e, lê diyardeyeka aborî ye. Li vir ew pirsyar derdikeve holê, ew diyardeya aborî jiber kijan hokarina serî hildaye.

Binemayê geşestandina Îranê di hêla cografîk de, liser du pajên navendî - fars û perawêzên nefars hatine danîn. Dewleta moderna Îranê jêwerî tenê rêya maneveya wê afrandina yek neteweyî ye û pêxemetê wê armancê jî cografîyaya paşketî û pêşketî afrand.

Geşepêdana navendê (navçeyên pêşkeftî) û paşkeftîbûna perawêzê (navçeyên geşenedayî) wisa kiriyê ku li cografîyaya navendê pişe û sermaye kom bûye, ev kombûn tenê qazanckere aborî nebûn, qazanckere siyasî jî afrand. Di heman demê de cografîyaya perawêzê tûşî lêçûrana sermaye û qeyrana pişe û kar bû. Ew navçeyên ku li perawêzên Îranê bûn hem sermaye têde nema hem jî tûşî hejarîyeka kûr bûn, heger wisa be, navçeyên paşkeftî di rastiyê de navçeyên hejarîyaya kulturî, civakî, aborî û rawestana siyasî ye jî.

Afrandina navçeyaya paşkeftî bû hokarek ku zexta aborîya sistematîk

li Kurdistanê serî hilde. Zext û guşara aborî ku di derencama pêşgirtina aborî jî aliyê hikûmeta navendî ve bi ser Kurdistanê de hate sepandin hemdem bû digel rêjeya bilindbûna şênîyan û lêçûrana sermayeyê li Kurdistanê. Vê hindê jî wisa kir, ku ne tenê sermayeya xwemalî li Kurdistanê nema, lê herwiha pişeyên Kurdistanê jî nekarin xwe digel xweligor mercên nû biguncînin û tenanet şiyana wan ya rikaberiyê digel navendê nema û berêvke bazara xwe ya li Kurdistanê jî dest dan û keftine perawêzê. Digel geşestandina Îranê, Kurdistan jî tûşî hejarî bêmecalî û bêkarîyê bû.

Bêkarî û geşeya nehevsan herdu bi hev re xelk naçar kirin, ku jiyana kolberiyê bo peydakirina jiyara xwe hîlbijêrin. Ji bilî her du mijarên li jorê amajekirî, tenê destmayeyahêza fîzîkî ya wî bixwe yan çarpêya wî biryarderê vî ketwarî nîne, ka dê di kijan sinorî, çî û çawan derbas bibe. Lê herwiha divê amajeyek jî bihête kirin liser wê mafyaya aborî, ku pêxemet sût û feyda xwe de, liser piştê kolberan kelûpelên xwe jî welatekî derbasî welatekî din dikin, bêyî ku ti gumrikî bidin yan ti yasa û rêsayekê bidine ber çavê xwe. Ev mafyaya aborî di derencama gendelîya sistematîk ya di nav hikûmeta navendî de çê bûye û roj bi roj diwerime.

Li vir em dikarin sê hokarên serekî jibo vê diyardeyê rêz bikin:

1. Têkdana sistematîk ya aborîya Kurdistanê û geşeya nehevsan jî aliyê dewletê ve
  2. Hejarî û nebûna derfetên kar
  3. Hebûna mafyaya aborî di dîsmana aborî ya Îranê de
- Ev sê hokar bûne sedemê wê yekê ku aborîya Kurdistanê tûşî diyardeyê bibe, ku jêre kolberî dihête gotin.

## KOLBERÎ ÇI YE?



Kolberî diyardeyeka aborî-siyasî ye ku jî encama siyaseta paşxistina aborî û ruwangeha emnî ya hikûmeta dewletê li Kurdistanê çê bûye û geşeyekalase ng afrandîye. Ji lewre rêkeftinê kolberî xwedanê barî rêkeftinek adu alî nîne ku di rewşeka asayî de hatibe pêk hînan. Ev rêkeftin di encamane bûnê aborî hejarîdanê aborî xwedanê aborî kolber de hatiye çê kirin.

Destnişan kirinê hokarên kolberiyê gring in, lê herwiha divê xîsarîna siyasî diyardeyeka kolberiyê jî bike ve bintirêjên tûşî jî ne. Divê di dewletê de mexdûr û tawanbar bi hête diyar kirin. Di xwandina geşîyayî hikûmeta dewletê kolberî wekî karekî di hête dîtinê ew jî wisa dike ku pênasê yaber pîrsên hikûmeta bokolberane ve: "kolber ew kes in, yê ku qanûnê binpê dikin, sinorê du welatan neqanûnî dibezînin, kelûpelên gumrukên kirî di hînanê awelati. Evca ew netenê liser aborî ya awelati metirsî ye, herwiha dikare bisertenduristîya awelati dike ku biberîsê kesê berceste rader bike. Ji lewre hikûmeta dibêje: "kolber qanûnê di xêrîna nîmetirsîyê dixîner jî yan acivakê û tengijîya aborî diafrînin." Di hember de hikûmeta wekî parêzerê jiyana aborî ya acivakê digel wan berengardibe û pîrasayî ye, di dema rûbirûbûnê de bi çî hînerên biryarên hikûmeta dikarin wan bidin berguliyên çunkî di peyrew kirinayasayê bixwe de jî hêzên emnî bibe digem bersiva kirdarên xwe didin.

Ew tîsîrawan ji qanûnê ye, şkandina qanûnê jî ruwangeha wan ve biguliyê dihête bersiv dan, bêyî ku terefê bi hête dadgehî kirin. Ango berî dadxwazîyê, tawanbar wekî tawan kar hatîye pênasê kirin jî ew redî hête cezakirin. Cezayê kubowî kolberî di hête diyarkirin, ligor kaprisî zewqê fersyan ser bazê liser sinore. Jibo hindê ye jî, gavakulidî jî kuştinê kolberan dadxwazî bodadgehê dihête rawanekirin, dewlet bisazî û ferdên xwe ve, xwe jî binberpîrsyarîyê derdê xe, hem hikûmeta di hête ber aet kirin hembikujê kolber. Ji lewre, kolber netenê tawanbare, tenanet wekî tawan kardî hêtelî qelem dan û di hîna tawanê bixwe de, kupêştî liser biryar hatîye dan, di hête cezakirin, ango bicezayê herigran, cezayê standina jîyanê. Ji bilî wan, siruştî barê nêşe şû hewayê jî behraxwe jî jiyana kolberan dibîne, ku rûdana canbextbûna kolberan di bîna şîte denimîneyawê ye.



Kolberî diyardeyeka aborî-siyasî ye ku jî encama siyaseta paşxistina aborî û ruwangeha emnî ya hikûmeta dewletê li Kurdistanê çê bûye û geşeyeka laseng afrandîye.



# PKKê Kani Yılmaz û Serdar Kaya çawan kuşt û bêdengîya YNKê!?

■ SHERI LAIZER\*

Gêrên "Tasluca" ji dûr ve xuya dikin û rengên wan yê qehweyî û belek di binê qateka çimîkî ji berfê de mane. Ev gîrên kani bajare Silêmaniyê dinerin, ji pişt meydana ku tijî "erebe - otomobîlên" şkandî û tîkçûyî jiber teqîn û bûyerên trafîkê, weki binereka bêdeng xuya dikin. Ev "erebe" ji zingarê re mane. Erebeyeka "Daewoo" spî û biçûk bûye perçeyek û komek ji lastik û hesinên tîkçûyî û şkestî. Banê erebê, ji xurtbûna teqînê, ji cihê xwe rabûye li kêleka "erebê" ye. Ev "erebe" hatiye kişandin da ku ew ji tevli "erebeyên" şkandî di vî meydanê de bimeixe. Meydan ji, girêdayî Yekîtî Nîştîmanî Kurdistan (YNKê) ye.

Min erebeya Kani di nava heriyê de perçebûyî dît. Cama wê ya pêşîn hilweşiyaye. Hîna ji ferek sola Kani liser pêlîka benzîne ye. Tevli ku Serdar Kaya (Sabriyê Torî) ku digel Kani bû di şewata erebê de bibû komir, lê kursiyê dawî yê erebê gelek ziyar nedibû. Kani erebe diajot. Qapaxê qutîka benzîne hîna li şûna xwe ye, lê heykelê erebê jiber teqînê li binê kursiyê ajovan çêbû, rûxiyaye. Sedema teqînê ne ku problemeka teknîkî di sendoqa benzîne de bû, weki ku berdevkê (YNKê) ji sazîyên medyaya û ragihandinê re got. Lêkolîngeha yan bişîkiya edlî ku li Brîtanîya ye, ev lêkolîngeha ku bi-karanîna rejîma Iraqê çekên kîmyasallî Helepçê tekez kiribû, eynî lêkolîngeh, peydabûna madeya teqemînî ya "C-4" liser sola Kani û ser axa li derdora erebeya wî li cihê bûyerê tekez kir.

Hin çavkaniyê sexte yê PKKê xwastin rastiyê reş bikin û veşêrin dema gotin ku pisporên ji (CIA) li dû raportalêkolîngeha (Analytichem) ne. Lê ne rast e, jiber ku min bixwe delîlên cînayî, piştî hefteyek ji bûyerê, ji cihê teqînê, birin, û ez bi şahidê sereke re axivim ku pisporê madeyên teqemînî yê ye û endamê partiya welatparêzên Kurdistanê (PWDê) jênawê wî Nizamettin Taş e ku ew ji berê berpirsekê leşkerî payebilindê PKKê bû û ji PKKê veqetiyabû. Herwisa min digel serokê hêzên ewlekariyê "istixbarat"ê YNKê jî axift.

Sozeka Kani bi sefaretxaneyê Almanya li Bexda hebû da ku piştî 2 rojan pasportê bistine û karibe vegere Ewropa. Bîyaradeshilatdariya Almanya derbarê daxwaza Kani ya penaberîya siyasî 2 sal berdewam kir.

## Dema Roma û Kongra Gel - çile/sebata 1999an

Dema Öcalan li Roma bû, liser daxwaza wî, ez û Kani em hatin Roma û em çûn villaya wî da em hevdiatîneka taybet bi wî re çêkin. Ez tim cihê rêz û hezkirina Öcalan bûm, belkî jiber ku bi zelalî daxivim û serbixwe bûm û ne endamê PKKê bûm. Dema K. Yılmaz di girtîgeha "Bêlîmarş" ku derwî Londonê digel hin endamê Artêşa Komarî ya Îrlandayê girtî bû, ez di navbera wî û Öcalan de diçûm û dihatim. Yekemîn car min Kani li Londonê dît, di sala 1994an de bû. Wê çaxê Kani berdevkê ERNKê (Eniya Rizgarîya Netewa Kurdistan: rêxistina PKKê li Ewropa) bû. Wê çaxê me civîneka bi revenda kurd li Londonê çêkir, ez jî, yek ji organîzatoran bûm. Ew civîn, berî ku Almanya daxwaza radestkirina Kani ji Brîtanîya



bike, piştî ku Kani bi şeweyekê eşkere derket û bi hin parlamentêran re axift. Ez gelek vecinîqim ji şeweyên zîkatiya nebaş ku bi wî re kirin, min bi grûpeka parêzerên Alman û Îngilîz re axivî û kar kir da em Kani berdin. 4 sal me şerekê qanûnî lidî radestkirina Kani ji Almanya re kir, jiber ku em ditirsyan wî radestî Tirkîyê bikin. Di dema serdanên min li girtîgeha "Belmarsh" li Londonê û girtîgeha "Calle" li Almanya min rastiyê Kani û bihnferhî û dilnêrmî ya wê baş nas kir.

Di 11ê Sibata 1998an ji girtîgehê hate berdan. Rikber û kesên di nav PKKê de ji Kani dilîng û nehez bûn, xwastin di navbera wî û Öcalan de kîn û nexweşiyên çêbikin. Vê ji rewşa Kani tengav û dijwar kir. Hevdiatîna min bi Öcalan re li Romayê sala 1999an ya 6emîn bû, jiber ku ji sala 1994an diçûm Şamê û min ew li wir didît. Di hevdiatîna dawî ya Romayê de, piştî ji min pirs kir, min ji APO re got; "çêtîre tu li Romabimînî û tim girîngîya çareserîya doza kurd bi şeweyeka aştiyane dubare û tekez bikî, û bêje ku hebûna min li paytextê Ewropî hîşmendîya netewî li cem kurdan zêde kiriyê û rê li ber çareserîyê vedike."

Piştî hefteyekê ji hevdiatîna me, Öcalan ji K. Yılmaz û Ali Hayder Kaytan xwast herin tevli konreyê 6emîn ya PKKê bibin. Wê çaxê, Kani berpirsê Ewropayê PKKê bû. (Nerînên me li Romayê weki hev derneketin). Gerek berpirsên PKKê nameya Öcalan bigihînin kongrê ku Öcalan dê li Roma bimîne. Kani û 3ê endamên din, peyati, ji Nexçivana Azerbêcan derbasî sinorê Îranê bûn, û ji Îranê derbasî Kurdistanê bûn, û ji wir derbasî herêma Xînerê bûn. Di wê demê de, Öcalan ji Rûsya hat qewitandin û kete wê rêwîtiya xwe ya dirêj ku baş nehatibû plan kirin û li cihekê ewle, derveyî Îtalya, digeriya, ta ku li Kenya hate girtin û revandin û di 15/02/1999an de radestî Tirkîyê hat kirin. Kani li Qendilê ma û bi hemû rê û şewazan hewl da ku guman û tawan barkirinên (PKKê / KADEK) liser xwe rake, jiber ku berpirsariya girtin û revandina Öcalan davêtin ser Kani.

Kani ne digel biryara vergera şer û tundiyê ya (PKKê - Kongra Gel) bû. Ev yek, hişt Kani û grûpa wî di hezîrana 2004an de ji rêxistinê veqetîn û ji Qendilê birevin û ber bi herêma di bin kontrola YNKê ve biçin. Li derveyî bajerê Suleymanî bi cih bû. Li wir, Osman Öcalan (Ferhad) û Nizameddin Taş (Botan) û hinekên din tevli wan bûn û Partiya Welatparêzên Demokratîk yê Kurdistanê PWD-Kê damezrandin. Berî ku ji Qendilê veqete û piştî biryara veqetandinê girt, di tevahiya sebata 2004an de Kani bi rêya telefonê bi min re daxivî û tirs û gumanên revandin yan kuştina xwe ji aliyê (PKKê-Kongra Gel) ve eşkere dikir. Jiber ku PKKê nahêle kesek bi mebesta muxalefetê ji rêxistinê veqete. Di mehên piştê de peywendiyên telefonê dewam kirin. Wê çaxê, daxuyaniyeka çapemeniyê da min û tede hemû sedemên ku hiştin ji (PKKê-Kongra Gel) veqetîn eşkere kir û armancên partiya PWDKê anîziman. Min ji ew daxuyani bi zimanê Îngilîzî ji malpera (kurdishmedia.com) şand û belavkir. Hûn dikarin hemû tîkçûnên orijînal yê daxuyaniyan di malpera PWDKê bibînin û bixwinin.

Di cotmeha 2004an de ez çûm Kurdistanê da ez Kani bibînim. Ji sala 1998an de min ew nedîtibû.

## Şehîdên PWDê

Di 6-7ê Cotmeha 2004an de kadroyekê PWDK, bi navê Şapûr Badoşyev yan bi navê rêxistinî Sipan Rojhilat, liser rêya Mûsil û Mexmûrê bi destê PKK hat kuştin. Wê çaxê ez li bajarê Silêmaniyê digel Kani bûm, dema telefon ji wî re hat û ew nûçeya nexweş ji wî re gotin. Ji nişkava, rûyê Kani hate guhertin û nexweş bû. Min ji xwe amade kiribû ku ji wî re wêneyekê/foto ji bo paseporta Almanî bigirim ji bo sefaretxaneyê Almaniyali Bexda bişînim. Ji aliyê derûnî ve, Kani hilweşiya. Rojnamevanekê kurdê Îranê bi xwe re bir da ku termê Sipan bibin bin ax bikin.

Cigirê Serokê HADEPê Hikmet Fidan ku peywendî bi partiya Kani (PWD) çêkir û jiber ku Fidan lidîji

vegera PKKê ya şer û tundiyê, ji aliyê PKKê ve li Amedê di roja 6/7/2006an de hate kuştin. Yê ku Fidan kuşt kujerekê profesyonel bû û li gori hin raporatan; navê wî Şerkan Şitlî (Deniz Olaş) e. Ango kuştina Fidan, piştî 5 mehyan ji kuştina Kani Yılmaz û Sabri Torî bû. Hin çavkaniyên tirkîyan hewl dan kuştina Fidan bi PWDê girêdin. Lê Fidan nêzîkî PWDê bû û PWDê bi tundî kuştina wî şermazar kir, tersî bêdengîya hevalên (DTP) ku nêzîkî Öcalan bûn. Jin û kurê Fidan behsa gefên ku PKKê li H. Fidan dixwarin, kirin, û gotin ku dixwastin bîzorê Fidan tevli DTP bikin. Wê çaxê, Leyla Zana û Orhan Doğan di DTPê de bûn.

Kemal Şahîni jî kurdên Sûriyê bû, ji PKKê veqetîya. PKKê ew kiribû serokê PYDê, lê Kemal û grûba xwe ji PKKê-PYDê veqetîya û ji xwe re partiyeka bi navê "Rêkeftin" çêkir. Kemal nêzîkî PWDê bû. Di 17/2/2005an de li bajarê Silêmanî ji aliyê PKKê ve hate kuştin.

## Sixurê PKKê Sabri kuşt

K. Yılmaz û S. Torî bi bombeyeka ku di bin kursiyê ajovan de hatibû bi cih kirin, hatin kuştin. Ew bombe, Veli Çat (Numan) ku li kursiyê dawî rûniştibû, çandibû. Bûyer di roja 11ê Sibata 2006an rûda dema Kani bi erebeya xwe ji kolana 60 ber bi herêma pişesaziyê ziviri. Bûyer li taxa "Rizgarî" ku ne gelekî dûrî navenda bajarê e rûda. Berî bombe biteq, V. Çat (Numan) bi bihaneya ku dê biçe CafeNet ji erebê peya bû.

Piştî ku bi rêya telefonê gefxwarin ji wî re hatin, Kani bi erebeya xwe ber bi kampa kesên ku ji PKKê veqetiyane ve ku li herêma "Seyid Sadiq" e çû, jibo ku hevalên ew agahdar bike ku PKKê di salvegera revandina Öcalan de amadekariya êrişekê liser wan dike. Kani di nivê wê şevê de bi min re axivî, lê Kani nizanibû ku ew armanca sereke ya êrişê ye. Berpirsên PWDê bi navê Veli Çat (Numan) bihiştibûn. Çat pasevanê taybet yê Murat Karayîlan bû. Hêzên istixbaratê yê bi ser YNKê ve eşkere kirin ku peywendiyên telefonê di navbera Çat û berpirsekê leşkerî yê PKKê bi navê Serdar re hebûn. Ev

## LÊPİRSÎN NEBÛ

using  
et light - 254 nm Faint spot RF-0.35 visualised  
distance travelled by centre of spot  
distance travelled by solvent front.  
our tests on virgin spots.

op diphenylbenzidine reagent (see 1.1.2.) Faint blue colouration.  
op imminobispropylamine/ pyridine reagent; no colour.

1  
gets the presence of nitro group containing explosives; eg RDX;  
result 1.1.3 (no colour) suggests the presence of a nitroamine eg.  
gets that the compound spot is nitro-containing but is not RDX.  
om the base line (very low RF value) under the test conditions. 1  
the compound spot is not TNT which would give a red colour.

its confirm the presence of nitro explosive residues on the shoe, 1  
t. To characterise the explosive present would require GLC (gas 1  
/lit) to be performed on the extract using ECD (electron capture  
section of nitro compounds. Also standards would be required. The  
present work.

Chief of Analytichem

27/04/2006

(J. E. Futter)

SI

on, J. and Zitrin, S; "Modern Methods and Application  
lysis of Explosives" Wiley 1993 ISBN 0 471 93894 7  
91, F; "Spot Tests in Organic Analysis"; 7th Edn. 1966 1  
tion 95 pp 300-302 inc.  
ref 1

J. E. Futter BSc, CChem, FRSC, FChromSoc, MIM  
Registered Analytical Chemist  
VAT Registration No 655 3740 26

Piştî hefteyekê jî kuştina Kani minîntî endamê PWDê nedîtin. Ji Hewlêrê ez vegeriyan Silêmaniyê da ez cihê bûyerê bibînim û delîlên kombikimî bicivînim û hinek zextî li YNKê bikim dakulê pirsînê kin û raportekê fermî derbarê bûyerê bidin û eşkere bikin. Kurê pê Kani (Selman) ku bî telefonê bîmin re axivî, ez birim cem Botan (Nizameddin Taş) û hevalêndînyên Kani. Li wê derê, ez di odeya Kaniya gelekî normal derazam. Di wê odeyê de ji bilî hinek cil û tîştên taybet û laptopê kumîni ji wî re anîbû, tiştêkdîntune bû. Mîncil û tîştên wî jî malbata wî re birin. Gelekî xemgîn bû. Tiştêkî Kani nema ji bilî saeta dest û berçavka xwendîne ku ew ji di bûyerê de şkestibû, û solekawi û taximêkugerek dirêwîtiya vegera Ewropalix webikira, mabûn. PKKê nedixwast Kani vegere Ewropajî berkulî wî gelek dihatnas kirin û hez kirin.

Serdar ji aliyê PWDê dihat nas kirin ku endamê istixbarata HPGê ye. Serdar madeya C-4 ya teqemînî yê dabû Çat. Piştê, ofîsa PWDê li Ewropa da zanin ku; "tîma kujer ji aliyê PKKê ve hatibû organîze kirin û Çat ji herêma Hîlwana girêdayî Urfayê ye, qaşo ji PKKê veqetîya ye û tevli PWDê bûye û li kampa "Seyid Sadiq" ya nêzîkî Silêmaniyê, bi cih bûye. Berî bûyerê bi demeka kurt, Serdar madeya C-4 ya teqîne da Çat. Û hemû peywendiyên telefonan di navbera Serdar û Numan/Çat de tomarkirî ne û hene." Hêzên ewlekariya YNKê piştê zanin ku Numan vegeriya veqetîyê Qendilê.

\* Nivîskar, rojnamevan û romanîvîseka Brîtanî ye. Dosteka maf û doza kurd e û hevala K. Yılmaz e. Ev nivîs di 8ê Sibata 2006an de hatiye nivîsandin. Ji îngilîzî hatiye wergerandin bo erebî û ji erebî hatiye wergerandin bo kurdî.





DARA BILEK

**G**ELEK insan hene ku behskirin û nixandina wan ehmet e. Yan ji mirov bi gelek gotinî dikare wan bide nas kirin. Idris Barzanî kesayetêkê welê ye. Kesayetêkê zana, entelektuel û xweşgotinî bû.

Min rehmêtî Idris Barzanî sala 1981ê nas kir. Lê piştî hevdîtina me ya cara yekê pêde, min dît ku insanekê ne mimkine ku mirov bi behskirinê kesayeta cenebê wî nas bike. Pêwîst e ku mirov bibîne, guh bidê û li gel cenebê wî bide û bistîne.

Her cara mirov cenebê wî didît ferî tiştêk nû dibûya. Gelekî xweş sohbet bû, her demî dilvekirî û bi hevî li pêşîya xwe dinêrî. Heta dema tengasiya de ji gelek bi bawerî behsa pêşerojê dikir û mirov dilkes dibû.

Ji aliyêk din wî dost û dijminên xwe baş ji hev nas dikirin û her demî li gora wê ji tevdiageriya. Di siyasê de xwedî zekayeka gelek berfireh bû. Dizani li gora qonaxa ku mirov tere derbas dibe siyasê biafrîne.

Di bawerîya min de taybetmendiyek ya wî herî mezin ew bû ku perspektîfek gelek berfireh li pêşîya xwe dinêrîye. Ji bo wê yekê jî dema pirsgrêkek şirove dikir yan di derbara bûyereki de helwêst dida nişan dan bi hemû aliyekî difikirî li gora xwe lêpirsin dikir û di dawiyê de biryar dida.

Tu cara dema biryarek bida nedigot ka kî dê çi bêje. Eger bawer bikira ew biryar rast e û berjewendiyên neteweyî de ye, di cih de biryara xwe dida û ji bo wê yekê jî gelek cara rexne hatine kirin. Lê her dawiyê de ya cenebê wî rast derketiye.

Dema di derbarê bûyereki de nixandinek bikira û mirov digel cenebê wî liser pirsêki gotûbêj bikira, her wextî bi belgeyan qiset dikir. Ji bo wê yekê piranî wekî cenebê wî dibû û mirov pê dihesiya ku di derbarê wê bûyera ku gotûbêj liser dihet kirin xeletîbûye û gotinên wan bûyeran ve girêdayî di derbarî wî de hatin kirin ne di cihê xwe de bûn.

Bê guman liser van tiştên ku ez dibêjim, gotûbêj liser dihet kirin xeletîbûye û gotinên wan bûyeran ve girêdayî di derbarî wî de hatin kirin ne di cihê xwe de bûn.

Bê guman liser van tiştên ku ez dibêjim, gotûbêj liser dihet kirin xeletîbûye û gotinên wan bûyeran ve girêdayî di derbarî wî de hatin kirin ne di cihê xwe de bûn.



SEMBOLA NETEWÊYÎ:

# ÎDRÎS BARZANÎ

Îdris Barzanî, her dem di nava pêşmerge de li enîya şer bû. Jiyana wî ya pêşmergeî gelek sade bû. Dema pêwîst pêşmergeyek di enîya şer de bû, di dîplomasiyê de asta herî bilind de serkeftî bû.

bûyerên objektîf hene ku di navbera min û cenebê wî de derbas bûne û her demî wekî cenabî wî derketiye. Lê di wê nivîsê de ku mirov cenebê wî yad dike ne cihê wê ye em behsê bikin. Miheqeq dê rojekî behsa wan tiştan jî bê kirin.

Vê yekê ve girêdayî dixwazim gotinek din bikim. Her dema wekî tevger wekî siyasê em nêzikî cenabê wî bûn em pêşketine û me serkeftin anîne. Lê her dema ku em jê dûr ketine û me gotinên ne di cih de derbarê cenebê wî de gotine, wekî siyasê me wîda kirîye û em paş ve çûne.

Piraniya cara, dema mirov bê hevî bûbûya û ti rêyek nedîta ku pêşîya xwe bibîne û di nava pirsgrêkan de wîda dibû û di wê rewşê de hevdîtinek ligel cenabî wî bikira di cih de cardin her tiştî li pêşîya mirov

ronidibû. Yanî mirov xemgîn biçûya balê bi keyf derdiket. Di demên tengî de jibo sekinandîya liser piya ev yek gelek girîng e.

Îdrisê her dem zindî dostê dostê xwe bû, kesayetêkê wefadar bû. Bawer nakim ku kesek wekî cenabê wî dost û dijminan ji hev nas bikira û li gora wê tevbigeriya.

Îdris Barzanî kesayetêkê sereki ye agirê Şoreşa Gulanê pêxist.

Mixabin Idris Barzanî ji wekî babê xwe Melle Mistefa Barzanîyê nemir gelek cara di çerçova îdeolojiya çepitîyê de hate nixandî û bi gelek nezaniyan rexne lê hatin kirin. Halbûkî wî jî zû de çepitî nas kiribû û dizani berjewendiyên Kurdistanê li ku ve bûn. Pîvana siyasê jî bo Îdris Barzanî berjewendiyên neteweyî bûn.

Piraniya kesên cenebê wî rexne

dikirin ew nas nedikarin û li gora gotinên vale, propaganda xelet û dezenfomasyonên dihat kirin, ew rexne dikarin, gelek kesan jibo ispat bikin ku çepên baş in rexne li Îdris Barzanî dikarin.

Pêwîst e mirov bikaribe wan qonaxa cardin binixîne rastîya siyaseta wê demê bibîne û li gora wê hinek tiştan jî nû ve binixîne. Ka gelo ewên ku xwedîyê rexneyan bûn çiqas Îdris Barzanî nas dikarin, çiqas jî helwêstên cenabê wî agahdar bûn. Ev hemû pirs in. Baş e kesayetêkê welê bi çi pîvana dihat nixandî? Ev jî pirsêk din e.

Hewce nake mirov behsa jirbûna Îdris Barzanî ya siyasî bike, ji xwe ew xwandevekanê gelek serkeftî yê rebaza Mele Mistefa Barzanî bû. Dema wê hat bû pêşkêşê wê rebaza pîroz.

HOŞENG OSÊ

Dewleta kûr ya Cemil Bayk III



Di lekeka yekem û duyem jî wê nivîsê de min got ku Öcalan gelek caran, bi şeweyekê direkt yan nedirekt, dida diyar kirin ku nelihvekirin yan ji hev tenehiştin di navbera wî û Qendilê de heye, lê ti carî PKKê û ragihandin û medyaya ew nedaye diyar kirin ku nakokî di wê mijarê de hene, û wan derew derdixine. Gelek derûdorên PKKê yan jî HDPê wê yekê baş dizanin, nemaze yên liberal û sivil ku xwe bêtir nêzikî Öcalan dibinin, lê newêrin wê rastîyê binin ziman.

Di derbarê nakokiyên navber Öcalan û Bayk de mirov dikare hin minakan binin ziman:

I - Bûyera rakirina Ahmed Turk ji serokatîya (DTP) û anina kadroyê PKKê Nurettin Demirtaş "birayê Selahattin Demirtaş". Wê çaxê, dewlet û hikûmet din bûn û ne tenê Nurettin Demirtaş kişandin leşkeriya artêşa tirk lê zext li Öcalan kirin da disa Ahmet Turk vege serokatîya (DTP). Öcalan nerazîbûna xwe diyar kir û bi tundî Qendil rexne kir û bi ya wî hate kirin.

II - Di tîrmeha 2011an de dema ku li Osloyê diyaloga bidîzî di navbera PKKê û MÎTê de hebû, HPGê êriş qereqoleka artêşa tirk nêzi Farqînê kir û 11-14 leşker kuştin. Pêvajoya diyalogê veguherî şer. Öcalan gelekî hêrs bû û li gorî çapemenî û medya tirk; "Öcalan ji wezaretê dadweriyê re nivîsand û xwast parêzerên xwe nebîne ji ber ku daxuanîyên wî şaş derdixin û digihînin raya giştî". Wê çaxê Qendilê digot: "hikûmeta AKPê "tecrîd" li ser Öcalan ferz kirîye".

III - Bûyera greva birçibûnê ya herî dawî ku Qendilê ji hemû girtiyên PKKê xwastibû bikin û bi hezaran girtî tevî wê mangirtinê bûbûn ku nêzikî 68 rojan devam kir û jiyana 520 girtî kete qonaxa metirsiya mirinê. Vê mangirtinê hikûmeta AKPê gelek tengav kiribû û ew xistibû krîzeka siyasî û exlaqî. Lewma hikûmetê hawar xwe bi Öcalan anî û wî jî fermana rawestandina mangirtinê da ku qaşo "gihîşt armancên xwe". Lê digel wê jî, Öcalan rexneyên tund li Qendilê kir û got: "Eger hinek kes hebin têkevin mangirtinê? Gerek ew kesên li derve bin, ne kesên di nav çar diwaran de bin". Mebesta wî jî Bayk û hemû kesên li Qendilê bû. Hinek çavdêr dîtî ku Bayk û Qendil, bi wê mangirtinê, xwastin Öcalan tengav û fedîkar derînin, ji ber ku ji sala 1999ê ve û ta niha, Öcalan rojeka tenê ji, neketiye mangirtinê di demekê de ku bi hezaran girtiyên PKKê jî bo xatirê Öcalan û xweşkirina rewşa wî, gelek caran çalakiya magirtinê lidarxistin. Lewra Öcalan bi hêrs û tundî rexne li Qendilê kir.

IV - Di 21.3.2013an de Öcalan daxuyanîyeka "dîrokî" da û rê li ber jidestwerdana çekan vekir û fermana vekîşandina hêz û şervanên PKKê derveyî sînorên Tirkîye da û got ku "denma şerê çekdarî çû". PKKê bi ya Öcalan kir û bersivjeka erênî da. Lê piştî hibijartina Bayk jibo serokatîya PKK-KCKê, di 9.9.2013an de PKKê biryara rawestandina vekîşandina şervanên da û pêvajoya vergeriya cihê yekemî ku jî destpêkir. Di 21.3.2014an de disa Öcalan daxuyanîyeka din da û tede xwast ku (HDPê) di kongreyeka lezgin mijara jî destberdana çekan gotûbêj bike. Û piştî ew serketina dîrokî ku HDPê di hibijartinê 2015an de bidestxist û giringiya qezencên siyasê û rawestandina çekan derket pêş, Qendilê di 13. 6.2015an de daxuyanîyeka balkêş derxist û bersiva Öcalan da û tede got: "mijara berdana çekan ne di destên Öcalan de ye û ne jî di destên HDPê de ye".

Ev bûyer û serencamên borî, beşeka biçûk in ji nişan û îşaretên ku nakokî û nelihvekirin di navbera Îmarî û Qendil (Öcalan - Bayk) heye. Di rewşeka wisa de mirov bi hêsani dikare bêje

I - PKKê êdî ne bi du seriyê (Öcalan - Bayk) tê birêvebirin lê bi çar seriyê ew jî C. Bayk e. Û Bayk jî ketiye bin bandor û kontrola Tehranê.

II - Bêdengîya Öcalan, nayê wê wateyê ku jî kiryarên PKK-KCKê yên wê dawiyê li bajarên Kurdistanê bakur razî ye. Öcalan dibîne çawan hemû deskeftên kurdan ku ji sala 1990î ve û ta niha, yeko yeko, ji dest diçin. Nemaze piştî ku Bayk "dewleta xwe ya kûr" bi yek carî li ser PKKê ferz kir.

III - Eger dewleta tirk Öcalan serbest berde, dê PKKê têkeve alozî û krîzeka mezin û hebûnî. Jiber ku dê 3ê rê li pêşîya wî hebin; yan dê xwe radestî "dewleta kûr" yan Tirkîye bike, yan dê xwe radestî "dewleta kûr" ya Bayk bike, yan jî dê xwe bêdeng bike û xwe jî hemû tiştî vekîne. Jiber ku Öcalan xwe kesekê sivil dibîne lê Bayk xwe generalê leşkerî yê payebilind dibîne û ti carî bi wî re nayê qurtandin ku ferman û emr û perspektîvan ji kesên sivil weke: Osman Baydemir, Leyla Zana, Ahmed Turk û Selahattin Demirtaş bistîne.

Niha dem dema "dewleta kûr" a C. Bayk e. Di wê "dewletê" de Duran Kalkan, Mustafa Karasu, Rıza Altun, Sabri Ok û Ali Haydar Kaytan... hwd cih û rolên xwe girtine, tenê M. Karayılan ku bêtir nêzikî Öcalan maye. Ligorî nerîna min gelek "sendoqên reş" hene ku gelek sir û razên û kiryarên nepenî û veşartî yên "dewleta kûr" a Öcalan û a Bayk jî dizanin lê newêrin bêjin. Ev "sendoqên reş" him di hundirê PKKê de hene û him jî rêxistinê veqetîyan e. Ya herî tal û bi jan û êş, li gorî nerîna min, ew e ku doza kurd li Kurdistan û Tirkîye ev 20-30 sal in bûye gogeka ji xwîn û agir ku "dewletên kûr" û yên eşkere pê dilîzin.

HER DI NAVA PÊŞMERGEYAN DE BÛ

**W**Kîher Barzanîyêkî Îdris her demî dinav pêşmerge delîniya şer bû. Jiyanawîya pêşmergeî gelek sade bû. Dema pêwîst pêşmergeyekê di enîya şer de bû, di dîplomasiyê de asta herî bilind de serkeftî bû. Idris Barzanîyêkî hêvî nehekarîyanîna aliyên siyasî de bû. Ew xwedî kesayetî gelek berz bû.

Bê guman hinek serpêhatî henek mirov dikare behsê bike. Ew serpêhatî henek mirov hinek gotinên cenebê wî kir wekî guhêrêkî guhê xwedî. Wê yekê hişt ku mirov bikêmasî bî kesayetî siyasê bîke û di rêyaxwedê bî îstiqar bî. Hetabaştî derdoraxwenas bike.

Wekî kur dibêjin zilamê gotinax webû. Lê gelek mixabin Idris Barzanî zehf zû jî nav me koça dawî kir.

Çûyîna wî jibo tevgera azadîxwaz a


Kurdistanê jibo xeta netewî Kurdistanî windabûneka mezin bû.

Rastî Idris Barzanî didem kî de jî nav mebar kirkunê demê çûyîna wî bû. Hêja ew bi hemû awayî jî botevgera azadîxwaza Kurdistanê pêwîstîyek bû.

Herweha rocardin mirov gelek cihandê dibîne ku ew bi hemû awayî di navaxeta neteweyî de zindî ye û dê hertim sembolekê be dinav tevgera azadîxwaza Kurdistanê xeta neteweyî Kurdistanî de.

Bimîna beta 30 salî ya wê fata cenabî wî ew bi hemû hestek neteweyî û dostane, birêz yad dikim. Ew dê her demî di bîra me de be.

Herweha gelekî spasiya Basê dikim ku ew derfeta ku ew cardin di xemgînî be jî, Îdrisê her dem zindî bi bîr binim û çend gotinan derbarê cenabê wî de bêjim.





## ÎMAJA KURDAN DI DÎROKNIGARÎYA DEWLETGERANE DE IV

## MÎNAKA SIMKO



KAMAL SOLEIMANI

**S**ISTEMKA duyanî ya kurdên sunnî lihmeber îranî û şeyên ne-kurd dikotomîya operatîv bû, ku hem kurdan û hem ji yên ne-kurd bi kar dihin. Loma, car û bar, jibo herdu alîyan, kurdîni pênaseya îranîbûnê bû, ku ciyawazîya serekî ya wan bi dabêşbûna sunnîti-şîetîyê dihat destnîşan kirin. Temeddun serpêhatîyê vedigêre ku ligor wê alimensebekê urmîyîyê rawêjkarîya wali Zefer ul-Seltene dike, ku ji hêrişbirina bi ser Kurdan de hezer dike, jiber ku bi bawerîya wî “kurd hemî qenc hatine hebû, şîrove dike. Telegram dinivîse, “hemî gundên dora bajêr [Makû] û enbarên eskerî [ji aliyê kurdan ve] hatine talan kirin û 30 misilman [şîe] hatine kuştin û hemî misilmanên [şîeyên] deverê li benda mirinê ne.” Ji raportê xuya ye, ku Encumenê hêrişkar, çî kurd çî osmanî, wekî misilmanên rasteqîn pênase nedikir.

Kesrewî telegramek ji Encumena Demokratên Urmîyê tomar kirîye ku bi zelalî, dijberîya dinî, ku di navbera alîyan de hebû, şîrove dike. Telegram dinivîse, “hemî gundên dora bajêr [Makû] û enbarên eskerî [ji aliyê kurdan ve] hatine talan kirin û 30 misilman [şîe] hatine kuştin û hemî misilmanên [şîeyên] deverê li benda mirinê ne.” Ji raportê xuya ye, ku Encumenê hêrişkar, çî kurd çî osmanî, wekî misilmanên rasteqîn pênase nedikir.

Di sala 1919an de Simko bi lawazîya eskerî ya Îranê hesiyabû û loma hengaveka radîkal di plana xwe de avêt. Di sibata 1919an de, wî lîderên civaka kurd kom kirin da ku ragihandina dewleta kurdî bi wan re munaqêşe bike.



Bonimûne El-Vuzera amajayî kesekê bi navê Mela Elî dike, û helwêsta wî wekî alîgirê kurdan, bixemsarî liser newiyet [nijad] û Îraniyet – ango milismanên şîe, tevî azerîyan – li qelem dide. Ev nimûne nişan dide ku kurd wekî ku tabî nejadêka din (newiyet) bin cuda ji îraniyên din (digel azerîyan) dihatin pênase kirin. Herwiha, hevgirtina şîeyan lihember kurdên sunnî carina bi hişarkirina sêmbolên ku ecemîti û îranîti tîkel dikirin, dihat encam dan. Bonimûne, gavaku Ziyau-Dewle, êriş bire ser kurdan, misilmanên şîe yê ne-kurd tevî hêzên wî bûn û bi tirkîya azerî dixwandin: “Yên ku tev nabin bila ji xwedê fedî bikin, canê me fedayê şahê Îranê, xwîna me helal be jibo dinê Îslamê [Allahtan utansin qalanlar geri, canımız fda şahî İrana, qanımız hlal dinî islama].” Her bi wî awayî, Mute-mid el-Wuzera, ku bixwe karbidestê hikûmetê bû, ti problemê di bîkaranîna şîetîyê wekî konseptêka dijîmanî lihember kurdîti û serxwebûna kurdan de nabîne, çûnkû diyar dike ku “Bêyî jinavbirina şeyên wîlayetê, estem e kurd bikarin bigihîjin istîqlala xwe.”

Daxuyaniya Simkoyî ji, ku piştî şkan-dina hêzên walîyê Urmîyê hat ragihandin, kurd û îraniyan ji hev vediqetîne û dibêje, “Hêzên navendîyên Kurdistanê êrişek birin... ser spahê dewleta Îranê, ku piştî sê seet şerêkê bêeman, [Hêzên Kurdistanê] ewşkanandin... û hêzên îranî bi temamî tarûmar bûn.” Rojnameya Simkoyî ya bi navê Kurd zanyariyên hêja liser wan amajeyên dijhev radestî

me dike. Rojname berdewam amajeyî kurdan wekî millet dike û wan ji gelên din yê îranî vediqetîne. Bo nimûne jibo me radigihîne ku “kurd bi cîranên xwe yê ermenî û asûrî re heta çar salan berî niha wekî bra bûn, lê îraniyan pîlanên komployê bi kar anin daku kurdan lihember kristîyanan rakin û niha ji pişt wan [ermenî û asûrîyan] digirin.” Rojname herwiha vedigêre ku milletê kurd ti çare nema û lewre çek hilda da ku “namûsa xwe biparêzin û şerê îraniyan bikin û wan ji çend wîlayetên Kurdistanê derêxe. Lê temamê izharatên ceraidên îranî-mehza kizbin û qiyama Kurdistanê bi navê menhûsê şeqawetê lekedar dikin.” Nimûneya jorê bi zelalî destnîşan dike ku qet nebe kurdên ku aktivên siyasi bûn xwe wekî îranî nediditin.

Evca ka gelo referansên jorê ji her du grûpan, ku xwe wekî emî lihmeber ew pênase dikirin karbidestêkê gerdûnî hebû yan ligor demên cuda, naverokine cuda hebûn, gringîyeka sanewî heyê. Encam ew rastiya ye, ku her grûpêkê liser bingehê vebirrkên dinî-etnik xwe cuda pênase dikir. Herwiha ev ji dihat diyar kirin, ku xelkî hingê konseptên dinî û etnik li dewsa hev bi kar dihinan, daku di vîzyonên etnawîyîyê xwe de tixûbên dinî-etnik û etnik bi Dîtirên xwe re destnîşan bikin.

## Ber bi serxwebûnê

Nimûneyên jorê bêtir peywendîyên Simkoyê bi yê nekurd re wêne dike, ku çî encamên berceste jê dernekeftin, jiber ku vebirkên nav-komelgehî nehatin kontrol kirin. Disala 1919an de Simko bi lawazîya eskerî ya Îranê hesiyabû û loma hengaveka radîkal di plana xwe de avêt. Di sibata 1919an de, wî lîderên civaka kurd kom kirin daku ragihandina dewleta kurdî bi wan re munaqêşe bike. Lêbelê, ragihandin hate paş xistin, jiber ku şewirmendê wî yê herî giring Seyyid Taha Nehrî hişdarî da, jiber ku guman liser reaksiyonên hêzên Rojavayî hebû. Nehrî di wê qenaetê de bû, ku tevgereka wisa dê dewletên tirk û qacar lihember dewleteka kurdî bike yek.

Nehrî haterkdar kirin ku jibo damezrandina dewleteka kurdî ya muhtemel li wîlayetên Tirkîya û Îranê here ba britaniyan daku ji wan alîkarîya malî û rahîna eskerî wergire. Herwiha, heger britaniyan eşkere yan veşartî alîkarîya kurdan nekir, qet nebe li rêyekê bigere ku britaniyan lihember dewleta kurdî ya plankirî astengan neafîne. Lêbelê, hevdîtina Nehrî bi karbidestên britanî re di şkanîneka tam û temam bû. Simkoyî şexsen ji hewl da xwe bigihîne karbidestên britanî, lê bîfeyde bû. Sebeba vê yekê ew bû ku kar-

bidestên britanî di wê bawerîyê de bûn heta ku Simko li wan derana be “dê nehêle kristîyan vegerin wan navçeyan û ji lewre divêt bihête siza kirin.” Lê helbet, çend salan piştê gava ku dîtî hêza Simko zêde bûye, xwastin dergehê danûstandinê pêre vekin. Lêbelê şkestina Simko bi destê “eceman, Dewleta Majesteya wê [Britanya] qane kir, derhal civîna di navbera Seyyid Taha û Efserê Asistan yê karûbarên Siyasi [li Kurdistanê Iraqê] de paş biêxe.”

Simko, piştî ku di wergirtina piştîgîriya Britanyayê de sernekeft, êriş bire ser gelek bajarên Îranê û ev bû sedem ku dewletên rûs û britanî piştîgîriya dewleta Îranê bikin. Hêzên eskerî yê Simko gelek serkeftin bi dest ve hinabûn û kontrola gelek bajarên Kurdistanê Îranê, ji Urmîyê heta Banê, keftibû bin destê wî. Simko desthilatdariya xwe heta Tirmeha 1922 berdewam kir, ku hingê di bin fermdehiya general Cehanbanî bi emrê Riza Xan bixwe, Spahê Îranê hucûm bire ser Simko. Kurdan egîtiyeka bêhempa nişan da. Ligor agahiyên General Erfe, “hingê deh hezar peyayên eskerî yê Ismail Axa hebû.” Arfa şahî di wê wafadîyê de canfidayîya hêzên Simko dike û radigihîne ku rêbazên wan yê şer ne yê eşîran bû. Liser roja dawîya şer, Arfa vedigêre “kurdan sibehekî çar caran êriş hinane ser me... ya sosret, ne bi tvingan, lê bi şûr û xenceran şer dikirin... ev cure şer ne şerê eşîran bû... ev şerê bi hêzên Simko re nedîşîbiya şerên berê yê bi kurdan re.” Sebeba ew bû ku hêzên Simko jibo “serxwebûna xwe” şer dikirin.

Di vî şerê de hêzên Simkoyî rastî şkestînekê hatin, ku hew dikarîbûn cardin rabin. Jiber hindê, Simko êdî ticarî nekarî hêz û prestîja berê telafî bike. Piştî salên sargunê û keşmeşên berdewam û têperkirina sinorên Îran, Iraq û Tirkîyê, Simko dawîyê kefte dehîk û kemînê û di sala 1930an de hate kuştin.

1 Temeddun, Muhammad. Awzâ' e İrân dar Jange Avval yâ Târikhe Rezâ' i' yeh [Rewşa Îranê di Şerê Yekem yan Tarîxa Rizaiyê]. Rezâ' i' yeh: Mo' asseseh-ye Matbû' âti-e Tamaddun, 1971. r. 324.

2 Kesrewî di hmad. Târikhe Hijdeh Salehye Azarbayjân / Dîroka Hejdeh Sale ya Azerbaycanê. 2 volumes. (Tehran: Matba' a-hye Tolu, 1934). Vol. I, 425.

3 El-Vuzera, Rehmet Xan. Urmîyeh dar Jange 'Alamsûz; Az Moqaddemehye Naşarâ tâ Bolvâye Esmâ' il Âqâ (1290-1300) [Urmîyê di şerê cihansoz de: Ji destpêka Nestûriyan heta Tevliheviyên Simko (1912-1322)]. (Tehran: Nashre Shirazeh, 1990). r. 495.

4 Kavianpour, Ahmad. Târikhe Rezâ' i' yeh

[Dîroka Rizaiyê]. (Tehran: Mo' asseseh-ye Matbû' âti-e Âsyâ. r. 161.

5 El-Vuzera, Rehmet Xan. Urmîyeh dar Jange 'Alamsûz; Az Moqaddemehye Naşarâ tâ Bolvâye Esmâ' il Âqâ (1290-1300)

[Urmîyê di şerê cihansoz de: Ji destpêka Nestûriyan heta Tevliheviyên Simko (1912-1322)]. (Tehran: Nashre Shirazeh, 1990). r. 512.

6 Ya berê, 440.

7 Ya berê.

8 Ali, 'Othman. Derâsat fil-Harakah alKurdîya alMu'âsirah (1833-1946)

[Etüdên Hereketên Kurdî yê Hevçax (1833-1946)]. Arbil: Maktab al-Taşîr.

2003. r. 346.

9 Ya berê, 346-7.

10 Ya berê, 347.

11 The National Archives. Eastern Reports.

Catalogue Reference: CAB/24/145. No. CV.

January 30, 1919, 182.

12 Ya berê, CAB/24/157. No. 78. Septem-

ber 13, 1922, 164.

13 Arfa, Hassan. Kurd. Werger. Hamid

Gewheri. (Sweden: Kitab Arzan, 1995). r.

81.

14 Ya berê, 81-9.

15 Ya berê.



## BER BI SERXWEBÛNÊ

**N**IMÛNEYÊN jorê bêtir peywendîyên Simkoyê bi yê nekurd re wêne dike, ku çî encamên berceste jê dernekeftin, jiber ku vebirkên nav-komelgehî nehatin kontrol kirin. Disala 1919an de Simko bi lawazîya eskerî ya Îranê hesiyabû û loma hengaveka radîkal di plana xwe de avêt. Di sibata 1919an de, wî lîderên civaka kurd kom kirin daku ragihandina dewleta kurdî bi wan re munaqêşe bike. Lêbelê, ragihandin hate paş xistin, jiber ku şewirmendê wî yê herî giring Seyyid Taha Nehrî hişdarî da, jiber ku guman liser reaksiyonên hêzên Rojavayî hebû. Nehrî di wê qenaetê de bû, ku tevgereka wisa dê dewletên tirk û qacar lihember dewleteka kurdî bike yek.

Nehrî haterkdar kirin ku jibo damezrandina dewleteka kurdî ya muhtemel li wîlayetên Tirkîya û Îranê here ba britaniyan daku ji wan alîkarîya malî û rahîna eskerî wergire. Herwiha, heger britaniyan eşkere yan veşartî alîkarîya kurdan nekir, qet nebe li rêyekê bigere ku britaniyan lihember dewleta kurdî ya plankirî astengan neafîne. Lêbelê, hevdîtina Nehrî bi karbidestên britanî re di şkanîneka tam û temam bû. Simkoyî şexsen ji hewl da xwe bigihîne karbidestên britanî, lê bîfeyde bû. Sebeba vê yekê ew bû ku karbidestên britanî di wê bawerîyê de bûn heta ku Simko li wan derana be “dê nehêle kristîyan vegerin wan navçeyan û ji lewre divêt bihê-

sizakirin.” Lê helbet, çend salan piştê gava ku dîtî hêza Simko zêde bûye, xwastin dergehê danûstandinê pêre vekin. Lêbelê şkestina Simko bi destê “eceman, Dewleta Majesteya wê [Britanya] qane kir, derhal civîna di navbera Seyyid Taha û Efserê Asistan yê karûbarên Siyasi [li Kurdistanê Iraqê] de paş biêxe.”

Simko, piştî ku di wergirtina piştîgîriya Britanyayê de sernekeft, êriş bire ser gelek bajarên Îranê û ev bû sedem ku dewletên rûs û britanî piştîgîriya dewleta Îranê bikin. Hêzên eskerî yê Simko gelek serkeftin bi dest ve hinabûn û kontrola gelek bajarên Kurdistanê Îranê, ji Urmîyê heta Banê, keftibû bin destê wî. Simko desthilatdariya xwe heta Tirmeha 1922 berdewam kir, ku hingê di bin fermdehiya general Cehanbanî bi emrê Riza Xan bixwe, Spahê Îranê hucûm bire ser Simko. Kurdan egîtiyeka bêhempa nişan da. Ligor agahiyên General Erfe, “hingê deh hezar peyayên eskerî yê Ismail Axa hebû.” Arfa

şahî di wê wafadîyê de canfidayîya hêzên Simko dike û radigihîne ku rêbazên wan yê şer ne yê eşîran bû. Liser roja dawîya şer, Arfa vedigêre “kurdan sibehekî çar caran êriş hinane ser me... ya sosret, ne bi tvingan, lê bi şûr û xenceran şer dikirin... ev cure şer ne şerê eşîran bû... ev şerê bi hêzên Simko re nedîşîbiya şerên berê yê bi kurdan re.” Sebeba ew bû ku hêzên Simko jibo “serxwebûna xwe” şer dikirin.





# HEMWELATÎNÎ DI BIN SÎWANA SERWERÎYA NETEWE-DEWLETÊ DE **JI REGNUM KRÎSTÎYANA HETA NETEWE-DEWLETÊN MODERN**

■ PIRJEEN SALIH

Jibo tégihîştina ka netewe-dewletên modern çewan peyda bûn, pêdivî ye çemka serweriyê di nav demê de bihête twêjin. Hatiye selmandin ku prosesa Reformasyonê li Ewropa bû ku paşê ji peydabûna dewletên serwer ên modern re rê vekir.

Weki pênasayeka otorîteya dewletê, serweriya serdema modern serçaveji heman îdean werdigirrit ku di sedsala 16an de geşe standin. Bi rêka ve çemkêye, ku otorîteya dewletê li hembert tebeeyên wê û dewletên din dihête rêkxistin. Weki Jackson (2007:10) derdibirrit "serwer çavkaniya tekane û dawî ya qanûnên dewletê û hemî nihênî û kirdarên otorîteya dewletê ye. Hikûmetekaserwer bi gelemperî hikûmeteka "azad" e, bi wî teherî ku ne girêdayî otorîte û qanûnên biyanî ye, ji bilî wan biyavan ku bixwe pê razî bûbe: bo nimûne bi rêya peymanina."

Serwerî çarçoveyeka siyasî-huqûqî ye, ku bi rêka wê dewlet ji destêwerdana derekî dihête parastin. Herwiha, serwerî di nav welatekî de merkeziyeteka pejirandî ye, ku jêre dewlet dihête gotin. Îdeya serweriyê ya serdema modern e; jiber ku antî serdema navîn e û peywendiyeka rasterast bi neteweyîyê re heye: hişmendî bi hesta aidiyeta bi neteweyekî re diyardeyek e, ku piştî damezrandina dewletên modern di sedsala 16an de çê bû. Jibo aşinayî digel paşxana dîrokî ya vî îdeyê pêdivî ye lênerînek liser tevgera reformasyonê ya wê sedsalê bihête encam dan.

## Yekineyên siyasî yê serdema navîn

Divê em bizanin, ku fakulteya entellektuel ya xelkî di serdema navîn de bi awayekî radikal ji ya me cîyawaz bû; bi wî teherî, ku derka wan ji xwe weki tak û aidiyeta wan ya gurûhî ji ya hemwelatîyên dewleta modern tîvel bû. Mirovên serdema navîn bi gîştî neşên weki hemwelatîyên dewletekê bihêne pênasê kirin, belkû divê di hîerarşîya beg, mîr û împarator û dawiyê Xwedê de, weki tebe bihêne destnîşan kirin. Weki Jackson (2007:30) diyar dîke, di serdema navîn de "li gundewaran, ku hema beje herkes li wir dijîya, otorîteyên kariger begên xwecihî yê xanan, biskoposên kelîseyan, serekên dêran û keşeyên navçeyê bûn. 'Gel' yan 'netewe' bi wataya îro tinebû. Boye, jiyana siyasî nedikarî ji aidiyeta dînî bihata vawartin; ev herdu rûberên jiyane hev hûnaye bûn. Vê hev hûnaye bûnê zanavek jibo tebeeyan afrandibû, ku renga mirov bişêr bêtir li welatên misilman ên serdema me de peyda biket, ne ku dewletên modern yê Rojavayê, çunkû weki Jackson (2007:31) amajedîket "îdeya aidiyeta netewe-dewletê û hesta hebûna zanavê neteweyî

hêsta di hişê xelkî de nehatibû daçandin. Xelkî bi şewazekê din xwe disêwirandin; ew kristiyan bûn." Ango pênasekerê zanavî ne etnîsîte yan ziman lê dîn bû.

Her yekineyeka cografîyaya siyasî di serdema navîn de weki "regnum" [padişahî, kraltî] di hate danimandin, ku "ne bala bûn ne serbixwe, ne 'dewlet' bûn ne ji 'netewe' weki ku em van tîrman tîdigihên. Jixwe hema beje ne mumkin bû mirov behsa sêjeyekê biket ku navê wê 'dewlet' bit. Bêguman padişahî yan mîrîtiyên biçûk û mezin hebûn. Kral, dük, yan rêveberiyekaheremî yan serekê terîqeteka dînî dikaribûn awayekê mîrîtiyê bikin, ku bi xanedan yan malbatên cindî ve sinorkirî bûn. Herçende mîrîti mîrasê malbatan bû. Kral otorîteyên navberî bûn: renga bi ser otorîteyên din de bi awayê demkî û spirîtuwal zal bû, li di bin emrê xwedê de û tenanet di hindêk babetan de di bin emrê papa de bûn. Padişahiyeên Brîtanîya û Fransayê weki Regnum Anglicana û Regnum Gallicum di hate pênasê kirin û di bin desthilata papasiya Romê de bûn.

## Hilguherîna laîte bo hemwelatîniyê

Prosesa reformasyonê û avabûna dewlet-neteweyan liseranserê ewropayê geşestand, lê jibo vî gotarê emê tenê mînaka Almanayê raderî çavan bikin.

Ev proses li Almanya, bi rêka materyalên çapkîrî ku ji aliyê keşeyên reformxwaz ve hatibûn nivîsin, bi sanahî jibo cewawereka berfreh hate berdest kirin. Yek ji sedemên ku piştgîriya girseyî jibo reformasyon dabîn kir, ev materyal bûn. Rê'yê xwe organîze kiribû û niha dikaribûn daxwazên xweyên di forma pêrista gazindeyan de formule bikin. Di nava lista gazindeyên wan de tenê amaje bi dehekên begên feodal û xizmetên bêberamber nehatibû kirin; di Donzdeh Madeyên Re'yê ten Swabîya di sala 1525an de vîzyoneka dahatîyê hatibû dariştin. Laîteya ku berê tebe bûn, niha derbasî qonaxeka dîn ya pêgeha siyasî û civakî dibûn, angû dibûne hemwelatî. Hemwelatîniyê pêdivî bîyî polîteyeka siyasî ku bi nisbetî derve û desthilata rebbanî serbixwe be, çênedibû. Ji lewre ye, dewletên neteweyîyên xwedan serwerî çêbûn. Bîrexma overtonên xweyên rebbanî, ku palpiştîya civakêka "xwedêtîr" dikir, xelkê asayî ji diviya "azad" bin û bi awayekê kollektîv biryarderê karûbarên civakî yê xwe bin û di heman katê de hukimran, anbigotinahingê "sovereign" [serwer] êdî di sexsekî bi navê kral de nedihate hebs kirin.

Herçende "nexşeya dînî ya Almanya û qanûna emperyal dereceyeka giring ya "serweriya" emperyal diparast, lê... monopolakulturiya Kilîseyê Katolîka Roman hatibû şkandin, û hem serweriya kulturi û hem ya siyasî bi temami hatibû vedarêhtin" (ibid. 49)

Serwerî ne ji hukimran, lêbelê de di sistema



hukimraniyê de bihata pênasê kirin. Xelkê asayî bi vî teherî pêdagirî liser mafên siyasî kirin û sistema feodal ya hingê guhertin. Bi guhertina wê sistemê re sistema hukimraniya tekane ji rastî guhertinê radikal hat. Bi vî awayî, desthilat di çemka serweriyê de hate pênasê kirin; çavkaniya serweriyê gel e, rewatiya wê ji gel dihêt û bi destûrê pergala hukimraniyê pênasê diket. Wate, bîyî hemwelatîyên azad, ketwarîbûna serweriya qanûmend estem e, û bîyî serweriya dewlet-neteweyê mafên hemwelatîniyê neşê bihête dabîn kirin.

## Çavkanî

- Jackson, R. (2007). Sovereignty, evolution of an idea. Cambridge: Polity Press.
- Keen, M. (1991). The History of Medieval Europe. Harmondsworth: Penguin Books.
- McGrath, E. (2004). The intellectual origins of European Reformation. Cornwall: Blackwell Publishing.
- Philpott, D. (2001). Revolutions in sovereignty. New Jersey: Princeton University Press
- Haig, C. (1993) English Reformations: Religion, Politics, and Society under the Tudors. Oxford: Clarendon Press.
- TeBrake, W. (1998). Shaping History: Ordinary People in European Politics, 1500-1700. Los Angeles: University of California Press

## PROTOTÎPA HEMWELATÎNÎYÊ: LAÎTE

Handlung / Artikel vnd Instruction / so fûrgend men worden sein vnn allen Rotten vnd hauffen der Dauren / so sich selamen verpflichtet haben: 1525: 222v



Bîserhildana krîza ku karigerî bi ser teokrasîyê de hebû, laîteyê tenanet otorîteya dînyewî jî birebin pîrsenîşanê. Ev çavî lora delokalbûya, çîcîndiyê desthilatdar yan mîrbûyî, kîdî pêgehên bilîndî hîerarşîya feodal ya serdema navîn de bû kefte bin pîrsenîşanê. Ji herderî bêtir ev diyarde li Swabîya yabaşûrê Almanayê diyar bû. Rê'yê ten Swabîya di sala 1525an de danezana "Donzdeh Madeyên Re'yê ten Swabîya" ragihandin. Ligor TeBrake (1998:23) "Van maddeyan tenê gîlî gazindeyê diyarkirî jî berkrîza civakocotkar û otorîteyê dîni pêrist nedikir, lê herwiha weki komelek jî prensîpan hatibû derbirînin ku di heman demê de hem şorîşgerane hem jî şorîşgerane nedî hilgirtinahê vî û daxwazên koalîsyoneka afrwanyatebeeyên siyasî yê seranserê başûrê Almanya bûn." Rê'yê ten Swabîya yê lîgor hêvojîyê kristiyanî dadperwerîya civakî digerîyan. Bisiroş jî fîsîrên teolojiyê Martin Luther, laîteyê jî pergala siyasî remeydandixwand. Lê nedî jî dîn bixwebûn, berovajî bî hêvojîyê dîni re wafî didanê daxwazên xwe û otorîteya he yê reddî kirin û "soz didan ku civaka Swabîyan lîgor prensîpên berzên qanûnên xwedê" dateşînin." (heman.)

## PEYDABÛNA DÎNÊ LAÎK Û KRÎZA DESTHILATÊ

Dawîya serdema navîn de çendî kitêb liser mîjarên dînî jî bo armançên seksîhatîna weşandin. Hejmarazemîyanan weşandinan rê dabû peydabûna bawerîmendî ya laîk, ku derveyî emrê çînaruhban, zanînan xweyateoloji kûr dikirin. Êdî monopolakulturiya rebbanî serbabetên dînî hatibû şkandin; xelkê laîk jî dikaribûn liser van mîjaran xwedî gotin bin. Dahînan amakîneyên çapê hîn bêtir otorîteya kilîseyê him dihêla siyasî û him dihêlateoloji de kêmkiribû, jiber ku vî teknolojiyê bisanahîyê kabê pişînerê dîna hilguhîstinî îdeyan jî çîyekî bo çîyekê dîn. Bi berdîstbûnê berhemîneoloji kûdî jî jî bolaitîyê (ewamûyên neruhbanbûn), monopolakîlîseyê liser dînî hate şkandin. Kilîseyan Împaratoriya Pîroza Roman berî destpêkirina Reformasyonê Lutherana, jimêjve, li hînterlandê bakurê xwe rastî krîza otorîteyê hatibû, jiber ku "binemayê rewşên bîrîyê Reformasyonê Lutherana wisaxuya ye, ku bi pluralîzma perwerdeyî ya serdema navîn yê derengge girêdayî be." (McGrath, 2004:

28) Pluralîzma perwerdeyî bî dî xwe repluralîzma zîmanî hîna; Incîlûgelek berhemîneoloji kû bo zîmanê gelêrî hatine wergerandin û jî bolaitîyê hatin berdest kirin. Hukmê dîni êdî bî zîmanê xelkî jî di hatine derbirînin; dîni dînefermanîne sepanî -gelek caran netegîhî jî bar -bû, ku ji jorê ve ji aliyê keşeyan ve bihata ravekirin. Dîni dî çavkaniya spirîtuwalîte û teqwayê bû ku dikaribû bî zîmanê xelkî bî xwe bihata derbirînin. Bî rê ya destresî bî die Sprache (zîman). Martin Luther êdî di şîyapeyama xwe ya pîroz bî die Sprachen (zîmanîna) bî gîhî negelên Ewropayê bakur. Van zîmanan berê vî kezanavê lokal jî bo axê verê xwe afrandin, bi taybetî jî bo tevgerên reformxwaz, loma "tonekazêde yanasyonalîstî dînavte vgerên pêşînyên reformxwaz û serbîxweyî xwazîya Swîs û bajarên başûrê Almanya..." dehebû. (McGrath, 2004:16)





PÎR ŞALYAR:W

# PIRA DI NAVBERA HER DU QONAXÊN DÎROKÎ DE

■ ENWER REWŞEN

**M**IROV di destpêkê bangadîroka xwe mijûlî pirsyarên cûr bi cûr e, wekî çima hatiye afrandin? Piştre çî bi serê wî tê? û ...

Di vir de ev pirs dihêt holê ka gelo di wê herêmê de bajarek hebûye? Jibo bersiva wê pirsyarê divêt em bêjin ku xelkê herêma Hewraman ji gundê Heramana Text re dibêjin "bajarê Hewraman" û sifetê "Text" jikurtkirîya peyva "Paytext" e û textê hikumdarî tede hebûye û liser çiyayên derdorê wan gundan asewarên Kelayên kevn dihên dîtin ku nişana cî û warê kevn li wê deverê de ye.

Pir Şaliyar, yek ji wan hizrimendan bû ku du qonaxên dîrokî yê neteweyê me bi hev re girê daye û rêbertiya beşek ji xelkê Kurdistanê kirîye ku bi mezinî û jîratîya xwe ya hekimane grîngî bi xelkê Hewraman daye û gehîştîye wê astê ku xelkê bawerîya xwe pê anîye.

Pir Şaliyar kî ye û çend kesin û li derbara wan çî nêrin heye û çî hatiye gotin? Em dê hewl bidin di wê nivîsê de bi kurtî qala wî bikin.

Li gundê Hewramana Text ku jêrê herêma Hewraman û bajarê Hewraman jî dihêt gotin, merqed û kesek heye bi navê Pir Şaliyar, ku di nav xelkî de gelek dihêt hez kirin û rêzdar e. Ji qedim ve xelkê Hewraman hebûna wî merqedê bi xêr û berket dizanin, lewre tevî derbasbûna hezar salan ew şunwar parastine ku pêk hatiye ji helbestên Merîfet û xaniyek ku ji kevirê mezin hatiye çêkirin û di nav merqedê de Çilexane, çirayek ronîkirinê heye ku di nav kevirê de hatiye bicî kirin û tede salane semaya dîni jî tede dihêt kirin.

Li ser wê yê yekê ku ew Pir kî ye? Di pirtûkên dîrokî de çend nêrinên cuda heye. Herwiha di nav xelkê de jî hinek nêrinên cuda liser wî hatine gotin.

Bila em destpêkê hinekî qala peyva Pir Şaliyar bikin. Mamosta Merdûx dibêje: "ji berê de li herema Hewraman jî zelamên dîni re gotine: Pir, Seyîd, Şêx û Baba". Di ferhenga kurdî de jî bo zanyarên mezin û payebilind ên dîni re dibêjin Pir. Peyva Şaliyar, ku bineret de Şehriyar e, di ferhengoka Moîn de jî hatiye gotin: 1- Şerîf

bajar, mezinê bajar, hakimê bajar. 2- Şah û Padişah.

Her wiha di ferhengên mamosta Mihemed Xal û Giva Mukrîyanî û Hejar de jî peva Şaliyar bi wezîr û hevalên Şah hatiye pêname kirin. Bi vî awayî jî peyva Şaliyar dibê: Mezinêkê dîni ku wezîr yan hakim û mirê bajêr e.

Di vir de ev pirs dihêt holê ka gelo di wê herêmê de bajarek hebûye? Jibo bersiva wê pirsyarê divêt em bêjin ku xelkê herêma Hewraman ji gundê Heramana Text re dibêjin "bajarê Hewraman" û sifetê "Text" jikurtkirîya peyva "Paytext" e û textê hikumdarî tede hebûye û liser çiyayên derdorê wan gundan asewarên Kelayên kevn dihên dîtin ku nişana cî û warê kevn li wê deverê de ye.

Pêwîst e bihête gotin ku di dînen kevn yê Irani de perestîna Hurmoz taybet bi mezinên welat, el û malbatan bûye. Pir Şaliyar, kesayetiyeke dîni û desthilatdarê herêma xwe bûye. Hebûna kevnê şopa semaya pir û ew baxên Gûzan ku niha jî bi milken Pir dizanin, her sal di dema semayê de liser xelkê parve dikin ji wekî belgeya desthilatdariya Pir dihêt danan.

Çavkaniyên piraniya wan behsên ku di pirtûkên dîrokî de liser Şaliyar hatine kirin, ligor nêrina min wekî hev in, jiber ku hemû axaftin wekî hev in û tenê cîyê hindek hevokan hatine guhertin.

Mamosta Merdûx di rûpela 123 ya beşa yekem ya "Diroka Kurd û Kurdistanê" de dibêje: "Her çiqas ku 850 sal bû dîne Îslamê hatibû nav xelê Hewraman, lê ew her liser dîne xwe ya berê mabûn û tevî ku di sala 824 koçî de ku Mela Guşayî dest bi hin kirin û ders û wane gotina Quranê li herema Hewramanê kiribû, lê xelkê dest ji pend û destûrên Pir Şaliyar bernedan e.

Dihêt gotin ku xelkê Hewramanê jî rûspiyên xwe pirsyar kirine gelo Merîfet kevn yan Quran? di bersivê de gotine ku Merîfet kevn tir e.

Ev mijar, ji koma wan pirtûkane hatiye kom kirin ku li derbara Pir şal hatiye nivîsandin. Di pirtûka "Menabî" û "Diroka Kurd û Kurdistanê" de, navê pirtûka Merîfet wekî yek ji çavkaniyan hatine binav kirin. Lê bi kurtasî behsa wê hatiye kirin, çêdibe ew jî di rêka wêjeya folklorî ya wê herêmê ve dev bi dev hatibe gotin û mamosta Merdûx jî ew gotin tomar kiribin û nivîskarên din jî çêrûka Pir Şal û



Merîfet jî wî wergirtin.

Sediq Bûrkeyî di pirtûka "Mêjûya Wêjeyî Kurd" de ku çavkaniya wê mijarê jî pirtûka "Serencam" wergirtiye, çend helbestên din liser Pir Şaliyarê yekem de wekî minak anîye û jî yê dîni zêde kirîye.

Merdûx, di berdevamiya behsa liser Pir Şaliyar de dide zanin: "Merîfeta Pir Şaliyar pêk hatiye ji pirtûkêka dîr û dirêj ya helbestan ku jî çend beytan pêk hatiye û dawîya her bendeke jî bi wê beytê bidawî dihêt.

Goşt ce wateyî Pir Şaliyar bo Hoşit ce kiyasteyî zanayî simyar bo

Yanî, guh bide gotina Pir Şaliyar û jî dil haya te jî zanayê remzbêjê hebe.

Xelkê niha yê Hewramanê "zanayê remzbêjê" wekî hêzê Resûl dizanin. Lê pêxemberê Îslamê Mihemed remzbêjê nebû û bêtirs û bi eşkere pêxemberî kirîye. Zanayê remzbêjê - her ew Zerdest e ku bi "wexşûr Simyar" yanî sandiyê remzbêjê yê bi nav û deng e, Pir Şaliyar wesiyet kirîye ku pirtûka Merîfet nekeve destê xelkê biyanî. Koma pend û hikmet û şîretên wî payebilindî û zanyarbûna Pir Şaliyar nişan dide. Pir Şaliyar di yek ji bendên xwe de dibêje:

Werwê werwe werine  
Werise birriw çîwar serin e  
Kergê siyawe hêlêş çermên e  
Goşlê marêw dîy berên e

ango  
Berf dibare, berfa xore ye  
Werise birri, çar serî ye  
Mirîşka reş, hêka wê spi ye  
Kûzik heger kun bû, du derî heye

Armanç û mebesta wî parastin jî êrişên dijmin e û dixwaze yekîtiya neteweyî biparêze.

Di benêke din de jî dibêje:

Daran giyan daran cerg û dil bergin  
Gahê pir berg in, gahê bê bergin  
Kerg ce hêle, hêle ce kerg in  
Rewas ce rewas, werg ce wergin

Yanê  
Daran can hene, cerg û dilê wan belg in  
Carina pir belg in, carina bê belg in  
Mirîşk jî hêkê, hêk jî mirîşkê ne  
Rovî jî rovî, gurg jî gurg in

Mebesta wê beytê felsefeya jîyanê û behsa kevnbûn û girêdan û têkiliyên tiştan dike û herwiha liser wê yekê ye ku, veguhertin di eslê tiştan de nahêt kirin. Merdûx dirûpela 125, yaheman çavkaniyê de bi vî awayî qala mijarê dike: "Pir Şaliyar nivîskarê pirtûka Merîfet e û wekî ku jî navê wê jî diyar e Zerdestî bûye û kalê Pir Şaliyarê Duyem e ku bûye misilman."

Pir Şaliyarê duyem di xewna xwe de Mihemed, pêxemberê Îslamê dibîne û radibe û îmanê bi wî dihinê û navê xwe dike Mistefa. Lê her ew nivîskar di rûpela 15 ya beşa yekem ya heman çavkaniyê de

li derbara Merîfetê de wiha dibêje "Xelkê herêma Hewramanê heta serdema Pir Şaliyarê yekem bi temami Zerdestî bûne. Pir Şaliyarê duyem ku bi nihênî bawerî bi Îslamê anîye û nekariye bi eşkere navê Îslamê bine, hêdi hêdi wata û rastîya Îslamê hinî xelkê kirîye û pirtûkê tîji jî pend û remz bo wan nivîsiye, bi navê Merîfetên Pir Şaliyar".

Ev gotinên mamosta Merdûx berova jî gotinên wî ye ku dibêje, Pir Şaliyarê yekem pirtûka Merîfet nivîsiye û Pir Şaliyarê duyem destkarî tede kirîye.

Di rûpela pêncem ya nameyên diwana Pir Şaliyarê Zerdestî de di derbara Pir Şaliyarê yekem de dibêje: "Vê hûnera parêzvan û xwedênas ku di sedsala 5ê koçî de jiyaye, navê wî Xwedêda kurê Camaspiyê Hewramî ye ku di sedsala 5. koçî de serî hildaye."

Di derbara vî kesayetiyeke di mamosta Ebdulkerim Muderis di pirtûka "Bînemaley Zanyaran" de qala Seyîdên Serget û Kakezekero elî Hewramana Text û jî dibêje: "navê Pir Şaliyar, Mistefa ye, kurê Xwedêdadê kurê Babilê û şecernameya wî digihîje îmamê Hesen".

Her di rûpela 362. ya wê çavkaniyê de hatiye nivîsandin: "Seyîd Ibrahim (babanûs) ku bi Mistefa Ezîzî dihat naskirin, kesekê pîroz elî Hewramana Text û jî re dibêjin Pir Şaliyar, diçe serdana wî û du salan cem wî dimîne... û tevî wê jî, zelamê mezin yê wê deverê bûye û liser rêbaza Zerdestî meşîyaye û agirperest bûye.

## ŞALIYAR SÎYAW

Pêwîst e ez di vir de amaje bikim ku li gundê Hewramana Text liser wê yakulî gundê Kemal diçe navgund, gorektenê heye û xelkê Hewramanê jêrê dibêjin Şaliyar Sîyaw.

Derbara Şaliyar Sîyaw dibêjin ew dost û xweşdiviyê Pir Şaliyar bûye û bi wî sifetî hatiye nasîn. Dibêjin rojekê Şaliyar Sîyaw gili li Pir Şaliyar kirîye û jêre gottîye, "xelkî jî te hez dikin ev jî bûye seba wê kuzê de guh nedin min. Ez dizanim dê piştî mirina min navê min jî dîwendabibe..." Dema Pir Şaliyar wê yekê dibihîze sozê dide ku wisalî xelkê bikenetenê jî Şaliyar Sîyaw hez bikin belkî pêşiyê serdanagorra wî bikin paşê serdanagorra Pir Şaliyar bikin. Ew soza Pir Şaliyar paşê dimerasima "Teriyê" dedihêt dîtin û hetaro jî rojî murîdên Pir Şaliyar diçin sergorra Şaliyar Sîywa. Jibome zelal dibekû kesayetiyeke payebilind yê bi nav û deng li wê herêmê hebûne û di nav xelkê de hatine hez kirin, yê yekem Şaliyar Sîyawe, ku çêdibe Pir Şaliyarê yekem be û Merîfet nivîsibe. Lê mirov dikare bipirse gelo çimê makalê Pir Şaliyarê duyem nediyare yê duyem jî, Mistefayê kûrê

Xwedêdadê Pir Şaliyarê duyem kutê kiliyek axurtî digel Şaliyar Sîyaw hebûye û heta astekî jî grîngî bi dîna berê daye.

Herwiha, wî bi sîd wergirtin jî paye û pileya dîni û civakî ya xwe, jî bo geşedana dîna Îslamê Merîfet guhertiye û hinekî tiştî biser dazê de kirîye û hêdî hêdî xelkê vewandîye ser dîna Îslamê.

Pêwîst e bihête gotin ku Şaliyarê duyem digel xwedênasî û nav û dengê hêzê Xews hevaltî û têkiliyê kirîye û di rûpela 41. ya pirtûka "Çimkêkî Mêjûy Merîwan û Hewraman" di wê derbarê dewiha nivîsiye: "Pir Şaliyar di qonaxa dawîyê ya serdema hêzê Xews de jî yaye û Xews gelek medhewî kirîye û fermûye: "Mistefayê birayê min zelema ketemame."

### Jêder

- 1- Ferhengê Moîn - Dr. Mihemed Moîn
- 2- Tarîxê Kurd û Kurdistan - Mihemed Merdûx - Tehran - 1324 (1945)
- 3- Mêjûy Edebî Kurdî - Elaedin Secadi

- 4- Tarîxê Camei Edyan - Can Mây Nas - Tehran - 1372 (1993)
- 5- Kurd û pêwîstîyê nejadî - Reşîd Yasemî - Tehran - 131
- 6- Bînemaley zanyaran - Mela Kerim Muderris - Çapî

- yekem - Bexdad - 1984
- 7- Diwana Pir Şaliyarê Zerdestî - Mihemed Behaedîn Melasahib - Bexdad - 1968
- 7- Mêjûy wêjeyî Kurd - Bergiyekem - Sediq Borekeyî - Bane - 1370









EDEBİYATÊ KIRMANCKÎ RA:

# Şiirê Açarneyeyî (2)



MUTLU CAN

**A**NCİYA hûmara diyine ya kovara Nüdemî (1992) de bi nameyê "Kam bi Edit Södergran?" yew nuştêyê Faruk Fakupî neşr biyo. Yakubî, şaire daya şinasnayîş û di şîirê aye; "Rojo Honik Beno" (Dagen Svalnar) û "Ez" (Jag) swêdki ra açarnayê û weşanayê.

Yewna çimeyê nê dewrî Armanç o. Hûmara 139. yêrojnameyê Armanç de (1993) 2 şîirê fransî hetê Bengîn Roşnî ra ameyê açarnayîş û weşanayîşê. Nameyê nê şîiran "Semedê To Ra Waştami" (Pour Toi, Mon Amour) û "Ariya Nimajî" (Déjeuner du Matin) yê û ê şîirê Jacques Prévertî yê.

Roşnî, hûmara 140. ya Armanç de (1993) "Rojo Verin" (Premier Jour) û "Payîz" (L'automne) û hûmara 141. (1993) de "Barbara" (Barbara) 3 şîirê Prévertî yê binî açarnayê û neşr kerdê.

## Barbara

Xwi vîrî biyari Barbara  
Varan varaynî ay roj bêvind Brest di  
Û ti rayîr ra şîinî ebi peşmiriyayîş  
Kêfweş, zerweş, hîy û şelpaya  
Binê varanî di  
Xwi vîrî biyari Barbara  
Varan varaynî ay roj bêvind Brest di  
Û ez rastê to ameya kuça Siam di  
Ti peşmiriyaynî  
Û ez zî peşmiriyaynî  
Xwi vîrî biyari Barbara  
Tiya ki mi ti nêşinasnaynî  
To zî ez nêşinasnaynî  
Xwi vîrî biyari  
Veynayoxê mi mirê piyazo kesk ardo,  
Boya qerenfilî yena cixarada mi ra,  
Wesarameyo koyandê Welattê min...  
Barbara  
Û ti ver bi jey vazdaya binê varanî di  
Hîy û şelpaya, kêfweş, zerweş  
Û to xwi vist verika jey  
Xwi vîrî biyari aya Barbara  
Û mi ra mecigîre eke ez to ra vana  
"ti"

Ayê ki ez tira hes kena ez hemîni ra vana "ti"  
Wazeno wa ez yew ray vêşêr jîni nêveyina zî  
Top ayê ki yewnan ra hes kenî ez hemîni ra vana "ti"  
Wazeno wa ez jîni nêşinasna zî  
Xwi vîrî biyari Barbara  
Xwi vir a meki  
Nê varanê mulayim û dilşay  
O ki riyê to yê dilşay ser o  
Nê şaristanê dilşay ser o (varano)  
No varano [ki] deryay ser o  
Tersanî ser o  
Gemîya Ouessantî ser o

Ex Barbara  
Çi ehmeqey a ceng  
Şe biya ti nika  
Binê nê varanê asinî di  
Adirê polay û gonî di

La ay camêrdo ki ti polanê xwi miyan di şidênaynî  
Ebi heskerdîş  
Tirê merd, vîni bi yan hema ganî yo?  
Ex Barbara  
Varan vareno bêvind Brest di  
Verê senî varaynî ayhewa  
Labelê sey verî niyo hinî û heme çî mahf biyo  
No yew varanê 'eza yê afaatin û dej-dayox o  
No hinî firtiney asin, polay û gonî zî niyo  
Tik û tena hewr î  
Yê ki sey kutikan gan danî.  
Kutikê ki [orte ra] cim benî  
Brest di awan ver o  
Û şonî durî helisiyênî  
Bresta ki te de çiyekî nêmeno ra durî  
Zaf durî.

Jacques PRÉVERT  
Frensizkî ra tadayox: Bengîn ROŞN  
cim biyayîş: vîn biyayîş, vindî biyayene  
deydayox: mehzûnkerdox, çiyê ki merdim te da dejeno, çiyê ki hin keno ki merdim çina ver keweno derya: dengiz, behr  
'eza: hezn, yas  
(Armanç, Hejmar: 141, Sweden, Tebax 1993, r. 10)

Kovara Rewşen a Tirkîya de 1993 de dest bi weşan kerd, hûmara 9. ya aye dema 2. şîiranê Ahmet Arifî; "Zerredî" (İçerde) û "Sewdaya To Mi" (Sevdan Beni) vînenime. Tadayoxê nê şîiran C. Zerdûşt Pîranîj o.

## Zerredî

Xebera to esta dêso kerreyin?  
Bero asinên, paja kori,  
Başna mi, ranza mi, zincira mi  
Resmo bêxem ki qonciktê mi do,  
Ez oxirdê to di şîyo merg ameyo  
Xebera to esta?  
Veynayoxê mi mirê piyazo kesk ardo,  
Boya qerenfilî yena cixarada mi ra,  
Wesarameyo koyandê Welattê min...  
Sewda to mi  
Sevda to ez ca nêverdayo,  
Ez veyşon mendo, teyşo mendo  
Şew tarî bî, xayîn bî,  
Gan xerîb, gan bêveng,  
Gan lete lete...  
Ew deste mi kelemçe dê,  
Bêtîtu, bêhewn mendo,  
Sewda to ez ca nêverdayo...

## Ahmet Arif


Tadayox: C. Zerdûşt PİRANÎJ  
(Rewşen: Kovara Edebî, Çandî û Hunerî, Hejmar: 9 Pûşber 1997, r. 19)  
Ez xususen yew detay îlaweyê nê qismî bika; goreyê zanayîşê mi; Şîirê Ehedê Xanî (4 beyitî) reya tewr verêne hetê N. Elî ra açarnîyayê kîrmanckî ser. (b. Armanç, no: 4, 1995, r. 27)

Serranê 2000an ra nata şîirê açarnayeyî  
Nê serran ra pey hîna zaf şîirî ameyê açarnayîş. Helbet ney de tesirê çend faktoran esto. Seke yeno zanayîş politikaya pêta ke Tirkîya de kurdî ser o tetbîq biyêne nê serran ra

dima vera-vera biye siste. Nisbet bi serranê verênan hîna vêşî fealiyetê zîwan û kulturî virazîyayî. Bi hawayo pêroyî kurdî resaye tayê îmkananê neweyan. Naye ra giredaye asiyaîşê (görünürlük) kîrmanckî zî bi zêde û qiseykerdoxanê kîrmanckî eleqeyêko muspet nişan da. Ez nê beşî de tena listeya kronolijîke ke şîma do tede şîirê keserra 2000î ra dima ameyê açarnayîş bivîne dana. Helbet ma eşkenê nê şîiran hetê senîniye ra zî tehlîl bikê la cayê ma qîm nêkeno. Mi di ke derheqê na babete de xebate nêameya kerdene û mi karêko winasî sey ihtîyacêk di û coka nuşt. Beno ke çend xeletî û kêmaneyê mi estbê. La ez hêvî kena na xebate bibo wesîle yê îlhamî ke çend kesî na babete ser o xebatêka hîraye bikê.

## Listeya şîiranê açarnayeyan ya kronolijîke (2000-2016)

Emily Dickenson, "Ez Semedê Rindê ya Merda", açr: Xecê [Hatice Yilmaz], Vate, h. 24, 2005, r. 156 (swêdki ra)  
Nurettin Duman, "Bediuzzaman Seid Nursî", açr: M. Mîrzani, Nûbihar, h. 101, 2007, r. 43 (tirkî ra)  
Jacques Prévert "Barbara", açr: Bengîn Roşn, Vate, h. 28, 2007, r. 165-166 (fransî ra, çapo 2.)  
Siyahpoş, "Ey Sînayey' Qelb û Ruhê M", açr: Malmîsanîj, Vate, h. 31, 2008, r. 18-19 (kurmanckî ra)  
Serhat Sever, "Mi Zerî di Coy Bena Ti", açr: Ö. Faruk Çetinkaplan, Nûbihar, h. 106, 2008, r. 70 (tirkî ra)  
Cemal Sureya, "Saye", açr: Roşan Lezgin, Vate, h. 33, 2009, r. 58-59 (tirkî ra)  
Şêx Rezay Talebanî, "Hacî", açr: Malmîsanîj, Vate, h. 34, 2010, r. 65 (farîskî ra)  
C. Sidqî Tarancı, "Ez Welat Wazena", açr: Wehdet Siwanîj, Şewçîla, h. 2, 2011, r. 44 (tirkî ra)  
"Baba Tahîrê Uryan" [Çend Dibeytiyî], açr: Mutlu CAN, Newepel, h. 7, 2011, r. 5, (kurmanckî ra)  
Ehmed Arif, "Zere de", açr: Newzat Valêrî, Newepel, h. 7, 2011, r. 8 (tirkî ra)  
Arif, Ehmed, "Sinayîşê To", açr: Rohelat Aktulum, Newepel, h. 7, 2011, r. 8 (tirkî ra)  
Dîldar, "Ey Reqîb", açr: M. Malmîsanîj & Roşan Lezgin, Newepel, h. 9, 2011, r. 7 (sorankî ra)  
Umer Xeyam, "Çarane", açr: Mehmed Yergin, Newepel, h. 11, 2011, r. 8 (tirkî ra)  
Selîm Temo, "Ê Cini", açr: Roşan Lezgin, Şewçîla, h. 3, 2011, r. 45 (kurmanckî ra)  
La Fontaine, "Qilancike û Luye", açr: Ozcan Yilmaz, Vate, h. 35, 2011, r. 9 (fransî ra)  
La Fontaine, "Di Qantirî", açr: Ozcan Yilmaz, Vate, h. 35, 2011, r. 10 (fransî ra)  
Ehmed Arif, "Ma Tena Niyê", açr: Netîce [Altun], Vate, h. 35, 2011, r. 41-43 (tirkî ra)  
Ferîd Xan, "Estanika Kutikanê Vêşanan", açr: Mehmed Sebrî Akgonul, Newepel, h. 23, 2012, r. 1 (kurmanckî ra)  
Ehmed Arif, "Merheba", açr: Newzat



AHMED ARIF  
MI HESRETA TO VER  
QEYDÛBENDÎ KERDÎ KEHAN

Valêrî, Şewçîla, h. 5, 2012, r. 48 (tirkî ra)  
Şêrko Bêkes, "Hûmaritîş", açr: Cemil Robar, Newepel, h. 25, 2012, r. 1 (kurmanckî ra)  
Boris Pasternak, "Adare", açr: Diyadin Şewsi, Newepel, h. 25, 2012, r. 8 (tirkî ra)  
Nazim Hikmet, "Meselaya Tahîr û Zuhre", açr: Ali Aydın Çiçek, Newepel, h. 28, 2012, r. 8 (tirkî ra)  
Umît Yaşar Oguzcan, "Mi Xo Vir ra Meke", açr: Bedriye Topaç, Şewçîla, h. 6, 2012, r. 30 (tirkî ra)  
Baba Tahîrê Uryan, "Delal", açr: Hesên Alkiş, Newepel, h. 37, 2012, r. 5 (kurmanckî ra)  
Sezaî Karakoç, "Duaya Varanî", açr: Mîrza Ciwan, Newepel, h. 42, 2012, r. 8 (tirkî ra)  
Ehmed Arif, "Ma Teyna Niyî", açr: Newzat Valêrî, Tiroj, h. 54, 2012, r. 13 (tirkî ra)  
Ehmed Arif, "Kuçeyê Qerenfile", açr: Newzat Valêrî, Vate, Hûmare: 38, 2012, r. 50-51 (tirkî ra)  
Ahmet Telli, "Ke Ti Şêrê Rijiyeno No Şaristan", açr: Netîce [Altun] W, h. 41, 2012, r. 11 (tirkî ra)  
Murathan Mungan, "Ma Xo Vir Ra Nêkerd", açr: Murad Aygun, Vate, h. 38, 2012, r. 84-86 (tirkî ra)  
Robert Herrick, "Şîira Robert Herrickî "Azeban Rê" Çeribnayîşê Çarnayîşî û Analiz", açr: Mahîr Dogan, Şewçîla, h. 9, 2013, r. 27-32 (ingilîzkî ra)  
"Fuzulî Ra Yew Xezele", açr: Newzat Valêrî, Newepel, h. 50, 2013, r. 1 (tirkî ra)  
"Pier Paolo Pasolini ra Şîirê", açr: Mutlu Can, Newepel, h. 54, 2013, r. 3 (tirkî ra)  
Ehmed Arif, "A Ya ke Mi Xo Vîra Nêkerd", açr: Newzat Valêrî, Tiroj, h. 61, 2013, r. 19 (tirkî ra)  
Cemal Sureya, "Fotograf", açr: Ali Aydın Çiçek, Newepel, h. 61, 2014, r. 8 (tirkî ra)  
Ehmed Başak, "Demêke Winasî de Mi ra Hes Bike", açr: İhsan Tektaş, Newepel, h. 63, 2014, r. 3 (kurmanckî ra)  
Ahmed Arif, "Şande Rew Nişena

Xapisnayî", açr: Newzat Valêrî, Tiroj, h. 67, 2014, r. 7-8 (tirkî ra)  
Murathan Mungan, "Qerenfil", açr: Murad Aygun, Vate, h. 41, 2014, r. 77-80 (tirkî ra)  
Mewlana Celaleddin-i Rumi, "Meke", açr: Şîhab Deştîj, Rojnameyê Zazakî, h. 5, 2014, r. 7 (?)  
Şêrko Bêkes, "Çehar Qeçeki", açr: Hesên Şêrko, Newepel, h. 72, 2015, r. 5 (sorankî ra)  
Siyahpoş, "Ey Hebibî Qelb û Ruhî", açr: Hemîd Hoza, Newepel, h. 72, 2015, r. 8 (kurmanckî ra)  
Sohrab Sepehrî, "Teyra Nîmîteyî Reyde", açr: Newzat Valêrî, Nûbihar, h. 130, 2015, r. 59 (farîskî ra)  
Sohrab Sepehrî, "Derya û Merik", açr: Newzat Valêrî, Nûbihar, h. 132, 2015, r. 81 (farîskî ra)  
Nahîd Ulvî Akgun, "Yewêk", açr: Necibe Kirmizigil, Newepel, h. 88, 2016, r. 6 (tirkî ra)  
Mehmed Akîf Yilmaz, "Hîrê Herfin", açr: Harûn Bozkurt, Newepel, h. 88, 2016, r. 7 (tirkî ra)  
Dr. Serkan Karadağ, "Pawitîşî Qeraxî De", açr: Seyîdxan Kurîj, Vate, h. 48, 2016, r. 71-72 (tirkî ra)  
"Yew Qismê "Mem û Zîn" A Ehmedê Xanî", açr: Murad Canşad, Vate, h. 48, 2016, r. 51-56 (kurmanckî ra)

## Netîceyê xebate

Goreyê netîceyê naxebate ez eşkena vaja ke edebiyatê 6 zîwanan; tirkî, farîskî, swêdki, fransî, îtalyankî û rûskî û 3 lehçeyanê kurdî; kurmanckî, sorankî û lorkî ra şîirî ameyê açarnayîş. Labelê tayê şîirî estê ke rasterast zîwananê înanê orjînan ra ney tirkî ra ameyê açarnayîş. Ez şêna çend şîirî ke orjîne înan rûskî, îtalyankî, lorkî û çend hebî şîirî ke eslê xo farîskî yê înan rê sey nimûne bida. Şîirê açarnayeyî yê tewr verênî tirkî ra ameyê açarnayîş û yê Ehmed Arifî yê. Tewr zêde edebiyatê tirkî ra şîirî ameyê açarnayene û şairo ke şîirê ci tewr zêde ameyê açarnayene zî Ahmed Arif o. Goreyê zîwananê orjînaneyê şîiranê înan hûmarê şairan nê yê: Tirkî: 15, farîskî 6, ingilîzkî: 2, fransî: 2, swêdki: 2, îtalyankî: 1, rûskî 1. Pêsero 34 kesan şîirî açarnayê kîrmanckî ser.

Kurdîya kîrmanckî de şîirê açarnayeyî 6 kovaran û 3 rojnameyan de weşanîyayê. Eyê ke sey kitab weşanîyayê 3 heb ê û nê yê:  
Nurettin Durman, Tijbazî (tirkî ra Zazakî: Hasîp Bîngol), Erguvan Yayinevi, İstanbul, 2012  
Ehmed Arif, Mi Hesreta To Ver Qeydubendî Kerdî Kehan (tirkî ra açarnayox: Newzat Valêrî), Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2014  
Baba Tahîrê Uryan, Diwonê Baba Tahîrê Uryan'î, (Çarnayox: Feqî Çolig), Weşanxaneyê Astun, İstanbul 2016





Esqer Ferhadî liser têkilîyên mirovî, exlaqên civaka Îranê û rewşa jiyana miletê nîv zengîn û jinên wê cemiyetê disekine. Lêbelê zemanê filmên xwe çarpê ava dike hetmen nakeve nav meseleyên polîtîk, yan jî xema peyamdayîne nake.

## JI DORHÊLA ÎRANÊ STÊREKA CÎHANÎ; ESQER FERHADÎ



SALIH SULEYMANÎ

**D**ERENCAM, bona ku mirov têra dilê xwe di bin baRe'na huner û beşera sînemaya Esqer Ferhadî de şil bibe, pêwîst e ku mirov rip î rût, şîlf î tazî, bêbar û bêkeser, bêxem û bêkeder derkeve hember filmên wî. Wê demê ew film wekî temaşevanên dirust mirovî bi dostanî pêşwazî dikin û bi mestanî jî rêwî dikin.

### Firoşkar û sînemaya wî

Sînemaya Îranê ku bona filmçêkerên cihanê wekî keşf û mijareka nû xuya dike, ji coxfayeyeka nêzik li kêleka Kurdistanê bang li me dike. Bi paşxan û kelepora xwe ya kevnare ve ev sînema lazîm e bona me kurdan bibe mînak û zêdetir bihête lêkolîn. Sînemaya Îranê ku gelek derhênerên heja diyarî alema kamerayê kirine, gelek pesn û aferînan heq dike ku yek ji Esqer Ferhadî ye; ez jî filmên wî hez dikim û tim temaşe dikim. Wekî dildarekê ve sînemayê sê roj berî niha ez çûm salonê û min filmê dawî yê Esqer Ferhadî temaşe kir. Derhênerê Îranî ve carê bi filmêkê din li ser zimanê sînefîlan dimilmile. Piştî ku bi Cudahîya Nadir û

Simîn xelata Oscars wergirt, li Fransa filmek bi navê Paşeroj kişand û vegeyîya welatê xwe carek din tûrikê xwe tijî huner kir û filmê bi navê Froşyar (The Salesman) kişand. Di filmê ku van salan li Îranê derbas dibe de, jin û mêrê hev Re'na û Imad şanoger in û listîka Arthur Miller ya bi navê Mirina Firoşyar difîzin, piştî demekê bar dikin diçin xaniyekê nû. Re'na li vir rastî destdirêjîyê dihêt, Imad berovajî jina xwe Re'naya ku ve traumayê bi aramî derbas dike, bi hêstir e û dixwaze tol hilîne. Vê çîroka Ferhadî ku mirovan wekî bobelîskê dorpeç dike û bêhempa diherike yek ji performansa listîkvanan li Festival du Cannes du xelat û gelek ji aferîn qezenc kirin.

Wekî di hemû filmên xwe de, di vê filmê de jî Esqer Ferhadî liser têkilîyên mirovî, exlaqên civaka Îranê û rewşa jiyana miletê nîvzengîn û jinên wê cemiyetê disekine. Lêbelê zemanê filmên xwe çarpê ava dike hetmen nakeve nav meseleyên polîtîk, yan jî xema peyamdayîne nake. Jixwe di hevpeyvîneka xwe de wiha dibêje; "Gava ku derhênerê bixwaze bi filmê peyamekê bide ev film baş nabe, ez naxwazim filmên siyasî bikêşim û jê bawer jî nakim. Ez zêdetir çîrokên dramatik ên têkilîyên mirovî û malbatî dinivîsim. Jixwe di têkilîyên mirovan de, siyasat, exlaq û malbat her dem heye. Em zêdetir sîneamatografi û şewaza sînemaya Ferhadî binêrin.

### Tesîra Pêla Nû

Ferhadî di 7 salîya xwe de pêrgî Şoreşa Îslamî ya sala 1979an tê, li welatê xwe Hunerên Dramatik dixwîne, liser derhênerîya sehneyan perwerdeya bilind distîne û bi kurtefilman dest bi derhênerîyê dike. Sala 2003 dirêjefilmaya xwe yekem bi navê Reqsa Nav Xubarê (Dancing In The Dust) kişand, sala 2004 Şarê Zindî (Beautiful City), sala 2006 Çarşema Sor (Fireworks Wednesday), sala 2009 Derbarê Elly (About Elly), sala 2011 Cudahîya Nadir û Simîn (A Separation), sala 2013 Paşeroj (Le Passé) kişand û bi filmê xwe Cudahîya Nadir û Simîn ve Xelatên Akademîyê û Berlinê tevde gelek xelat qezenc kirin. Sala 2012an kovara Time ew di nav 100 mirovên herî bandordar ên cihanê de nişan da.

Ferhadî yek ji wan nêşê sêyem e Pêla Nû ye ku wekî her deverê cihanê li Îranê jî gelekî zû deng veda. (Piştî Ebass Kiyarustemî, Cefer Penahî, Muhsîn Mexmelbaf, Samîra Mexmelbaf, kesên wekî Behmen Qubadî, Esqer Ferhadî, Mazyar Mirî ji nîfşên dawî yên ve pêlê tîsê hesibandin) Her çî be jî bandora Pêla Nû ji Îtalyayê derbasî Tirkîyê bû ji wir jî derbasî Îranê bû. Her sînemagerê Îranî Yilmaz Guney dinase û bi tesîra wî ve film kişandîye. Esqer Ferhadî di hevpeyvîneka xwe li Tirkîyê de dibêje; "Hemû derhênerên Îranê Yilmaz Guney dişopînin û ez jî gelekî jê hez dikim. Bandora Guney wekî rêçeka hunerî tim liser min e. Xeyala her derhênerî ye ku wekî wî li Cannes û qadên din xelatan wer bigirin". Dîsa di roportajekê de jê dipirsin gelo xwe zêdetir wekî derhêner yan senarîst dibîne; ew jî xwe piranî wekî senarîst binav dike, çimkî dema dinivîse jî derhênerîyê zêdetir xwe kelecana û kêfxweş hîs dike.



Jixwe ev nûner û şopînerên vê Pêla Nû ya Îranê, jiyana rojane û bûyerên ji rêzê bi şewazeka helbestî dihonin û rastî û qestîya jiyandî di nav hev de dikelînin dikin buxûr. Taybetîya wan a sereke ew e ku tiştê lokal bi terzeka unîversal dikêşin. Piştî her filmêkê xwe bi ya min Ferhadî gaweka din jî bilind dibe û derdikeve asta jor, her ku diçe zimanê sînemaya wî hêsantir û zelaltir dibe. Dema mirov awayekê kronolojîk filmên wî temaşe dike wekî ku ji alema rasteqîn derbas be têkeve alemeka sîmûlatîf, piştî her filmê tahmeka tîrş di devê mirovan de dimîne û wekî serxweş û sermest di bin bandora xwe de dihêle.

Ji Reqsa Nav Xubarê heta Firoşkar çiqas ji destê wî tê zimanê sînemaya xwe hêsantir dike, liser mirovên asayî ku jiyana wan tesadûfî rastî hev tîsê disekine. Em di Şarê Zindî de dibînin ku çawa jiyana jineka genc û hevalê birayê wê dem bi dem nêzikî hev dibe. Derbarê Elly jî wisa diherike û mamosteyeka genc çawa di nav jiyana hin mirovên jî rêzê de tûşî xetên wan dike derdikeve pêş me. Çîroka van jiyandîyên pêrgî hev hatine di Cudahîya Nadir û Simîn û filmê Çarşema Sor de jî tê dîtin ku heyata malbata zengîn û jineka karker bi hev re derbas dibe. Ew jin wekî karker dikeve mala wan zengînan peydeyê pey jî dikeve navenda kêşê û pirsgerêkên wan. Di Firoşkar de dîsa mesele liser jinekê rû dide û di nav bûyer û mijaran de merkezîbûna wê jinê nişan dide. Filmografiya Ferhadî ku carinan wekî belgefilm dewam dike, temaşevanên bêyî rîza û daxwaza wan kaşî nav kêşeyan dike û şevkorî di nav de dihêle. Temaşevan gav bi gav dikeve nav çîrokê û her ku sirîfşa dibin adrenalîn û meraq jî bilind dibe pê re. Heta ku film dewam dike aliyên baş û aliyên nebaş ên karakteran aşkere dike ku temaşevan dikeve şûna wan. Herçiqas mijarên wan jê cuda bin jî ez vê temayê car bi car di filmên Michael Haneke de dibînim.

### FIRAT CEWERÎ

Erich Auerbach û Mimesîsa wî



Dibe ku ev sernav bi hinan ji we xerîb were. Loma, heqê we heye ku hûn bipirsin; Erich Auerbach kî ye, Mimesîs çî ye? Digel ku Erich Auerbach di dîroka entelektuelîya dinyayê de navekî giran û Mimesîsa wî jî kitêbeke sereke ye, dîsa ji li Tirkîyeyê û dibe ku li Rohhilatanavîni jî kême kes wî û berhema wî nas dikin.

Heke Mehmed Uzun bi nexweşîya kanserê nekata û zû ji nav me koç nekira wî ê li ser nivîskarê Mimesîsê, Erich Auerbach, romanek binivîsanda. Uzun di salên berî mirina xwe de pir konsantreyî vî alimî bûbû û li her derê behsa wî dikir. Mîna jiyana Memduh Selîm Beg û ya Celadet Alî Bedir-Xan, Mehmed Uzun ê bi rengekî spehî, kirasekî xweşik e edebî li Erich Auerbach û berhema wî ya nemir Mimesîs bikira û bikira ku hem kurd, hem jî tirk bala xwe bidin vî alimî û li ser berhema wî hûr bibin. Ez nîzanim ka bi zanebûn e an jî bi nezani ye ku ev alim û berhema wî li Tirkîyê hatiye bincilkirin û di bédengîyê de hatiye jîbirkirin.

Min bi xwe ne zûde navê Erich Auerbach bihistiye. Ez cara pêşî di salên nodî de bi tesadûfî li kitêbxaneyeka Swêdê pêrgî navê wî hatim, lê heta hingî jî min tiştêkî wî nexwendibû. Min berê ev nav ji Mehmed Uzun jî nebihîstibû. Mehmed Uzun di salên xwe ên dawî de piştî xwe dabû Swêdê û berê xwe bi Tirkîyê vekiribû. Piştî ku çûn û hatinên wî ên Stenbolê zêdetir bûn, wî dest pê kir û behsa wî navî kir. Wî dixwest Erich Auerbach di serê xwe de bikemilîne û ji romaneke xwe re bike lehengê sereke.

Erich Auerbachê ku alimekî cihûyê alman bû, xwe jî ber zîlma nazîstan dabû alî û di sala 1935an de berê xwe dabû Stenbolê. Stenbola kozmopolît hemêza xwe ji Erich Auerbach re vekiribû û jê re donzdeh salan mazûbatî kiribû. Lê heke mazûban baş be jî, sirgûn bi ês e. Digel ku Erich Auerbach dixwest êşa xwe ya sirgûnê bi analîz û afirandina berhemên edebî û lêkolînên ilmê edebiyatê bike jî, dîsa mirov bi taybetî ji nameyên wî fêhm dike ku wî êşeke sirgûnê jî kişandiye. Ew di nameyeka xwe de weha dinivîsîne. "Ez ji aliyê paşverûyan ve wek biyanî, ji aliyê antisemîstan ve wek cihû, ji aliyê nasjonalîstan ve jî wek alman, an jî biyanî dihatim dîtin".

Digel wê jî, Auerbachê erbabê ilm û zanîne, bi qîmetê dema xwe ya sirgûnê dizanibû û hemû dema xwe bi xwendin, lêkolîn û nivîsandinê dibuhurand. Herçiqas wî gelek jî dema xwe dabe likolîna li ser Dante jî, dîsa ew herî pir bi kitêba xwe ya bi navê "Mimesîs" navdar e. Yê min jî, her ku riya min bi Stenbolê diket û ez diketim kitêbfiroşan, min çavên xwe li Mimesîsê digêrand. Gava min ew li ba kitêbfiroşan peyda nedikir, min berê xwe dida ba kitêbfiroşên antik û bi hêvî bûm ku ez ê wê kitêbê li wir peyda bikim. Gava min ew li wir jî nedidit, ez bi xemgînî û destvala vedigeriyam.

Gelo maqûl bû ku ew kitêba ku li Stenbolê hatibû nivîsandin û yek ji kitêbên dinyayê a sereke ku analîza edebiyateke sêhezarsalî dike, wernegeriyabe tirkî?

Gava min fêhm kir ku ew wernegeriyaye tirkî, bi rastî ez acêbmayî mam û ez aniha jî ecêmayî dimînim. Ji ber ku tirk, piştî avakirina komarê û bi taybetî jî di dema wezîrtiya Hasan Âli Yûcel de girîngîyeke mezîne dane wergerê û hema bêje hemû klasîkên dinyayê wergerandine tirkî. Dema ku Hasan Âli Yûcel di salên sihî û çîlî de wezîrê perwerdê bû û dest bi reformên kulturî û hunerî kiribû û giranî dabû ser wergerandina edebiyata dinyayê, Auerbach li sirgûna Stenbolê noqî berhema xwe ya bi navê Mimesîsê bûbû. Digel ku ew berhem wek berhemeke sereke ya analîza edebiyatê tê dîtin û demeke ewçend dirêj di ser re bihuriye jî, hê ew wernegeriyaye tirkî. Ez nîzanim çima heta niha wê berhema bala weşanxane û entelektuelên tirkan nekêşandiye û heta niha xwendevanên zimanê tirkî jî xwendina wê bêpar hatine hiştin?

Erich Auerbach di Mimesîsê de gotina nivîskî ya pîroz wek bingehê edebiyatê digire û dîroka edebiyatê ya sê hezar salan di bîst beşên kitêbê de analîz dike. Ew jî Tewratê û Odysseusa Homeros dest pê dike, herdu berhemana dide ber hev, li ser karakter û rastîyên pêbawer ên herdu berhemana hûr dibe, bi sernavên balkêş heta dema me tê û li Virginia Woolfê radiweste...

Erich Auerbachê ku di sala 1892an de li Berlinê hatibû dinyayê, di sala 1930yî de bûbû profesore filolojîyê, di sala 1935an de jî ber zîlma nazîstan li Stenbolê bi cih bûbû, di sala 1947an de jî Stenbolê koçî Amerîkayê kiribû, di sala 1957an de jî wefat kiriyê.

FROM THE DIRECTOR OF THE ACADEMY AWARD WINNING A SEPARATION  
"Outstanding. A subtle psychological thriller."  
- PHILIP FRENCH, THE GUARDIAN  
"A masterpiece.  
The less you know in advance, the better."  
- DAVID BORDWELL, OBSERVATIONS ON FILM ART



about elly  
a film by Asghar Farhadî



### JINÊN FERHADÎ

**D**EMA Ferhadî liser çîroka mirovên jiyana wan tim rastî hev tîsê disekine, piranî jinan dide merkeze. Ev çîrok jî sê-çar rojan pêk tîsê teqez dawî lê nayê, wisa nivco û şikber dimîne. Wexta van hikeyatan dijene, zêdetir tîsêgehên hegemonîk ên wekî edaletê, zayendên cîvakî, têkilîyên malbatî, sincên nîv zengînan, hêza civaka xwedî sinif mîna mûyekî dirêse. Mirov dikare her gav wê tîsêşîna wan kesên dikin ku tevî û sazûmana jiyana xwe biparêzin, bona wê pergale çawa derewan dikin, çawa exlaq bînpê dikin çavdêr bike. Lê wekî min got di merkeza van tiştan de tim jin hene û bi ya min Ferhadî gorî gelek kesan zêdetir erênî li jinan dinêre û karakterên wî jin her dem xwedî torpîl in. Jin û nîrxên civakê tîsê pîrsyar kirin û bersiv bi çavê temaşevan ve tê diyarkirin. Bi kurtasî, di nav hemû karakteran de jinên Ferhadî zêdetir bala mirovan dikêşin.

Derencam, bona ku mirov têra dilê xwe di bin baRe'na huner û beşera sînemaya Esqer Ferhadî şil bibe, pêwîst e ku mirov rip î rût, şîlf î tazî, bê bar û bê keser, bê xem û bê keder derkeve hember filmên wî. Wê demê ew film wekî temaşevanên dirust mirovan dostanî pêşwazî dike û mestanî jî dişîne.







